

Nr : 12  
ADAR  
1997

Weşana  
Enstituya Kurdi  
Ya Brukselê

# AGAHDAARI



Cand  
Huner  
û  
Wêje

Du  
Mehî

NEWROZ

Pîroz be !

# *agahdarî*

*Weşana Enstituya Kurdî ya Brukselê*

Kovara  
Cand, Wêje û Huner

*Berpirsiyar*  
**Medenî FERHO**

*Redaksiyon*  
**EJDER**  
**Kerîm M. BAQUSTANÎ**  
**ŞÊRGÖ**  
**Mistefa QESRÎ**  
**Wezîrê EŞO**

*Navnîşan*  
**Rue Bonnels Straat 16**  
**1210 BRUXELLES**  
**BELGIQUE**

**Tel:** 00 32 (0) 2 230 89 30  
                  230 34 02  
**Fax:** 00 32 (0) 2 231 00 97

*Nivîskar berpirsiyarên nivîsên xwe ne*

*Hoyêñ Abonetiyê*  
**Salê: 6 hejmar 1000 FB**  
**50 DM**

**KURDÎ**

**ALA**

**DENGÊ**

**MIN E**

## **NAVEROK**

- |                               |    |
|-------------------------------|----|
| 1/Pêşgotin.....               | 3  |
| 2/Di Hunandina Dewlefî de     |    |
| Rola Çand û                   |    |
| Biserketina Ramangîrî         |    |
| -Medenî FERHO .....           | 5  |
| 3/Bipêşveçûna Gotinêن         |    |
| Biyanî Di Zimanê Kurdî de     |    |
| -Dr. Zerdeşt HACO .....       | 9  |
| 4/Pirsgirêkên Çandê           |    |
| -Prof. Nîkos SVORONOS .....   | 14 |
| 5/ Portre -FEQÎR EHMED- ..... | 16 |
| 6/Ji Bo Pêşerojeke Çandî      |    |
| -Kerîm. M. BAQUSTANÎ.....     | 18 |
| 7/Rexne û Rexnegîrî           |    |
| -Bedirxan EPOZDEMİR .....     | 19 |
| 8/Mandele Kirina Kor û Kerr   |    |
| -Mihemed QAWAS .....          | 20 |
| 9/Were Dengê Min              |    |
| -Mehmed AKTAŞ .....           | 22 |
| !0/Mijulaya Hunermend         |    |
| -Ehmed OKTAY .....            | 23 |
| 11/Qelew û Zirav (çirok)      |    |
| -ÇEXOV A. P. ....             | 24 |
| 12/Sewiyê Gund (çirok)        |    |
| -Abbas M. ABBAS .....         | 25 |
| 13/Stranbêj Mihemed Şêxo      |    |
| -ŞÊRGÖ .....                  | 27 |
| 14/Artîstên Sant-Petersburgê  |    |
| Yêñ Kurd                      |    |
| -Temûrê XELÎL .....           | 28 |
| 15/Robin Daryo                |    |
| -İbrahîm El-ERÎS .....        | 29 |
| 16/Nameyeke Têr Mînak         |    |
| -Şukran ERGÎNCÎ .....         | 30 |
| 17/Ji Bo Xwedayê              |    |
| ‘Şâhberhema Tune’ Çend Pirs   |    |
| -Zulkuf GUNAY .....           | 32 |
| 18/Nameyek Giring             |    |
| û Dîrokî                      |    |
| -İsmet Şerîf WANLI-           |    |

*Helbest: Derwêş M. FERHO, Teymur EVDÎ,*  
*Yurda KAYA, Bayê CEMBELÎ, Mihemed*  
*ABBAS, Elî Fuad BALLÊ, Kerîm*  
*BAQUSTANÎ,*

Dabas**DESPÊKEK PÎROZ**

*Her destpêk nabe nûjenî, lê her nûjenî piştî demekê pêwistiya guhertinên bingehîn dibîne û mirov pêwistî avêtina hinek gavan dike. Lewra, piştî destpêka agahdarî ku berî salekê di rengê bultenî de derdiket û di destpêkê de 4 rûpel bûn, piştre bû 8 rûpel, encam û hoyên qonaxa iro em gihadin kovarek hemdemî. Bi rastî amadekirina kovaran hewqasî ne hêsanîye. Nexasim di nava me Kurdan de. Berî her tiştî bazara pirtûk, rojname û kovarên Kurdî misrî, qels û di wateyek mirî de ye. Ku bazar qels, misrî û mirî be, jiyandana kovaran zor e. Hingî ev karê pîroz û giranbiha dibe bar û dikeve ser milên xwedî û berpirsiyaran. Yan jî saziyan... Herwekî ku kovar her dem bûyîne dibistanên nivîskaran, holka pêşbazî û bijartinên nirxandina rexnegîrî, béguman ji bo me Kurdan jî, derfet û hoy çibin bi hejmarek zêde weşana kovaran pêwist e. Xala duyemîn nivîs in. Li her çar hêlên cîhanê pîpinga devê dergehîn kovaran ji nivîskaran xalî nabin. Nivîskaren nûpêketî ji dosya û defterên xwe ku tejî destnivîsin dixine bin çengên xwe û qista navnişanên kovaran dikan. Yanî, dergehîn kovaran dibe holka têkili û nirxandina rexnegiriyek zanistî û danûstandina hosta û şagirtiyan.*

*Ji ber vê çendê, bi biryara derxistina kovarek nû û hemdemî re, me name nivîsin û li dora sedeki bela kir. Armanc ew bû ku bala nivîskaran bê kişandin û wan bi ser binbariya nivîsandinê, hewldana kovarê de daf bidin. Kovarên Kurdan kêm in. Yen ku derdikevin jî, hember hewqas ked û nirxê giranbiha bi delaliyek dilşahî bela nabin, na gihin destên her kesî Nivîskar jî di nav de... Bi vê armancê me xwest ku têkilî di navbera kovara agahdarî û nivîskaran de çêbibe. Yek mirovî bi tenê bersiva me da. Dr. Zerdeş Haco... Bi rastî rewşê bala me kişand û em gihane baweriyekek ku nivîskaren me di xeweke şêrîn û tenezariyekeq neqam de ne. Ev qonaxa internet û telekomünikasyonê û qonaxa ku gelê Kurd ketiyê, bêhtirîn ji her demê pêwistiyek karûbarê bê westandin derdixe hemberî nivîskaran. Demjiyanê dûr û dirêj hatine windakirin*

*Çand û wêjeya Kurdî bi zordariyek têr xwîn hatiye talan kirin. Ew çand û wêjeya di nava rewa erdê de ku bi sedan sal in pişkiviye, kat daye tarûmar bûye. Ax û av û kevir kûç, bi giştî cografya, dîbin nalê hespêñ kevneperekstan de dinale. Dil û kezeba mirovên li ser dergûşa şaristaniya cîhanê cîwarbûne û qet bala xwe nedane ked û warêñ cîranan, bi nalêñ û axînek bêzar dike qare-kar. Bi sedan sal in e ku ew dil û kezeb bi dilojarê dîlorîne. Heya bi mirovên xwedî paye jî zimanê Kurdî ku berî pirr gelan berhem pê hatine dayîn, pirtûkêñ oли yên pîroz pê hatine nivîsandin didine mandelayê. Dibêjin nîne... Gelo!?*

*Kes ji me nikare dilê xwe xweş bike û hember van çawtiyêñ dîrokî, tinaz û yariyêñ xwe bike, hewl nede xwedî derketina rastiyê. Rastî bi xwedî derketinê rastî ye. Mafû dad û rastî bi xwedî derketine dibe malê mirovan. Tu padîşahî, tu qeran û serdarî bi xweşî û dilsozî ne gihaye miraza xwe. Her zirhêñ xwe li xwe kirine, her şûrê xwe hejandine. Çand, ziman û wêje jî wilô. Nirx şînqşen cîhanê şev û roj kirine yek, bi sed salan e ku pirtûkxaneyêñ xwe bi destnîvîsan xemilandine. Kovarêñ hinek welatan ev sedûpêncî sal in ku bê rawestandin derdikevin. Nivîskarêñ Kurd hê wêjeya gelê xwe ya devkî serrast ne kirine û bi giştî dernexistine meydanê. Dev ji nivîsandina pirtûkîn helbest, çîrok, roman, azmuneyî, sergûzeşti, mîzahî, şanûgerî berbidin.*

*Pêwistî bi zorê heye. Bêguman zor tenê ne dar û doqik û çekdarî ye. Mebesta min zora pênûsê ye. Pênûşşorêñ me, hewl bidin da gavekê ber bi çand û wêjeya cîhanê ya hemdemî biavêjin.*

*Bêguman her gav avêtîn qelsî û kemasiyan di nava xwe de dihilgire. Di vê gava me de jî wê hinek qelsî û kemasî hebin. Hêvî ew e ku di hejmarêñ pêşerojan de ev kemasî û qelsî nemînin. Rûpelên agahdarî ji bo her nivîskarê Kurd re vekiriye. Werger, helbest, nivîs û her curê din yê lêkolîn û wêjeyî bikêrî me têñ. Nivîsandin rûmet e...*

### agahdarî

### DERWÊŞ M. FERHO

### **KEVOKA SPÎ**

**Kevoka spî li jorê  
bi fire xwe di bilindahiyê de  
li bin konê asmanê şîn  
bi birîndariya çengê xwe  
li hêlinkekê, nerm û bê tirs, digerê**

**Dema tu liqasî wê kevokê bibî  
birîna wê zêdetir kûr neke  
berde, bila ew li rêya xwe herê  
loma ew, ne li gorê, lê li jînê digere**

**Eger şiphe ket dilê te jî  
bêhnferehiyek bide ser dilê xwe  
û li sitrana wê guhdarî bike  
ku tu derd û kulêñ wê bibihîzî  
çawa ew ji sedema evînê birîndar e**

**Eger şipha te hê jî ji dil ne çû  
li çavêñ wê binêre  
gotinêñ zêrîn tev hêvî xuya dikin  
qet nebe wan bixwîne û bawer bike**

**'Ez çûkek im, hebûna min azadî  
xewn û weyalêñ min evîn û astî  
di nav agir de li hawîrdor  
fira min ger e, hewar e, ya sitar  
ku vê birînê ji dil û çeng bavêjim der'**

**Fira kevoka spî ne ji kêfa dil e  
ew cih û war nahêle li paş  
û dil nake çêlî bikin zare-zar  
Dema cîhana di ronhiya çavêñ wê de  
bi kîn û şermezár agir pê ket  
wê da rê ku bigerê li hêlinâ bi rûmet**

## DI HUNANDINA DEWLETÎ DE ROLA ÇAND Û BISERKETINA RAMANGÎRÎ

**Medeni FERHO**

Bîrdozek heye ku jîndariya dîrokê bi serdestiya rêvebiriye re heye. Lê, hember vê bîrdozê, tiştekî din tê gotin ku rawanî û herka rêvebiriya serdest, ji merc û hoyen zêde binçavkirinê, roj te ku azadiyê bitixub dike, maf û xweparêziya kesayetî, civakî pûc dike. Rê li ber serdestiya zordar ku bi navê diktatoriye tê naskirin vedike. Li gorî her du dîtinan erkê bi epistemolojiya serdest re tê girêdan Herwiha li gorî hunandin û diyarkirina Tewratê, pêkarîbûn ne di destên mirovan de ye. Yanî viyanek (îradeyek) cuda heye. Ev jî dem e... Dema ku destpêk û dawiya wê mîna xîşkekê heye û her du hêl jî bi xelat in. Destpêk, yanî pişkivandin, stewihandin, ferehî, dirêjî û xelasek. Xîşkeke bi destpêk û bi dawî... Yek heye, dawî, yanî xelasek çiqasî bi xelat be jî, winda ye. Tiştê ku ez têdîgihijim, xelaseka xîşkê hewqasî ne winda ye. Çiqasî bi destpêk û stewihandin û ferehbûnê ve girêdayî be jî, li gorî hinek armancan hatiye diyarkirin. Bêgoman, Tewrat pirtûckeke herî kevne û serkêsiya, dîroka mirovaniye ku bûye du serî, ya olî dikişîne. Tewratê, xweda kiriye malê gelê Cihu. Ruerda du-sê kîşweran jî kiriye warîdatê wan. Ru erdeke pîroz e ku Xwedayê mezin ew bi sinor û tixub kiriye, xelat daye vî geli. Herwiha Qur'anê jî, zimanê cihana duyem êxistiye rastmalê xwe û dojeh û behîş lîgorî berjewendiyê tuxmê erek bikar tînin. Helbet têkiliyê dîrokê ji çand û şaristaniyê hatine qutkirin.

Xwedayê Tewratê hember şaristaniya Misrê dîlzariya xwe di rewsek din de nîşan daye û şer kiriye. Cenabê Mihemed ferehtir lê kûdandiye û 'cîhada mezin' hember şaristaniya Mezopotamya kiriye. Her du hêlan jî ne mîna Sezar kazox kûtane, şûr hejandine, cih û war kirine destên xwe. Parîkî Mihemed nêzîkî vê dibe, lê bingeha Mihemed nêzîkî Tewratê ye. Lewra têkiliyê dîrokê û gelan avrûyî ne... Di nava gelên dewletî de, çand û dewlet hember hev in û herwiha serdestiyek pêkarîbûnî (tahakum) derdikeye holê. Serdestiya pêkarîbûnî ya Tewrat û Qur'anê, hemberî dîroka rasyonalîzma marksîzmê serketiye.

Heger em li van şaxê dîrokî bi awirek hişmendî binêrin, pirr vekirî diyar dibe ku di her du pirtûkên olî de têkiliyê navbera mirov û xweza de hatine ji bîr kirin. Rêvebir û qendê (hişmend/aqlîmend) xwedî raman û hewngîrên wan deman, ku pirtûkên

mîna Tewrat û Qur'anê afirandine di têkiliyê navbera mirov û xweza de, her çiqasî tixub û sînorêñ erda baweriya xwe fereh dîtibin jî, têneğîhişibûn. Şerê hember xweza, ne şerekî hêsa ye. Herwiha şer e, bilî dijwariyê, şerekî duvdirêj e. Di wê demê de pirr şer hebûn. Bingeha afirandina Tewratê li ser şerê navbera 'Benî İsrâîl' û Fîrawunan de hatiye avakirin. Bingeha Qur'nê jî 'futuhat' e. Her duwan jî xwe spartine şer. Car din, rastiya dijwariya şerê hember xweza û serketina mirov ku wê bibe şikandina girêdana bi xweda ve, ne dîtine. Serketina hemberî xweza, serketina îdeolojîk, hember girêdana dilpenahî ya bi xweda ve ye. Weke tê zanîn, di demjiyana îro de îdeoloji û aborî ketine zîqa hevûdin. Ew îdeolojiya ku mêjî jî xwe re kiribû bingeh, her çiqasî li ser dilê xwe bipûwe û serketina hember îdeolojiya olî diyar bike jî, derew e. Tewrat, Êncîl û Qur'an hêza mezin di destên xwe de digirin. Serdestiya rêvebiriya komên xelkê dîkin. Marksîzmê, rasyonalîta aborî û mêjî kiribe destên xwe de jî, termînolojiya bingehîn ava nekiriye û rastiya dîrokê lîgorî daxwaz û erka xwe nexistiya stuna jîyanê.

Goman têde nîne ku dîrok ne mîna daxwaz û hêviya **Bertolt Brecht** e ku di helbesteke xwe de dibêje 'gelo aşçiyek jî tunebû li cem Sezar', yan jî, mîna **Halîl Înalçık** ku dibêje: 'Ne dîroka dewletê, dive dîroka gel bê nivîsandin.' Bê çiqasî erk, yanî serdestiya rêvebirî xwedî hêzên zîrek, jîr û zînde ye, çand jî hewqasî xwedî hêzên zîrek, jîr û zînde ye. Car din, di nava gelên dewletî de, çand û serdestiya rêvebirî de dijberî û hemberhevhatine ku pirraniya caran bi pêkarîbûnê (tehekkumê) dawî dibîne, derdikeyin. Dinamîzmêñ dijberî hevûdin derdikeyin holê. Bê gotin, baweriya rast ew e ku nivîsandina dîroka gel, dinava zanistiya dîrokê de, gaveke nûye, herwiha pêwiste jî. Dîroka bavûkalêñ me, ji hunandin û ristina weseleyêñ skeletên civakê dûr be jî, rastiya çand û jiyana rojane (jiyana rojane rolêñ mezin ne leyize jî) di nava xwe de diragire.

Naxwe!.. Li gorî hoyen li jor derdikeyin hemberî me, ci di derbarê dîroka olî de, ci di derbarê dîroka rastî ya ramangîrî û hewngîrî de, pêwistiya nivîsandina dîroka Kurdan di encam û hoyen din de derdikeye hemberî me. Di stana Kurdan de êdi ne tenê ked, xwîn bûye berdêla jiyane azad û birûmet. Tu pêwisti ji bo keşifkirina Emerîka

nemaye. Qonaxa îroyîn dinavbera du cîhanan, bi gotinek din dinavbera du ramanan de şerekî dorferehî ku di nava pêt û rimiyêng agir de dibirije heye. Cîhana kedxwerî û li xwe xwediderketin... Ramana kedxwerî ku her daxwaza **ezgorî** û **ezbenî** dike û ramana mafparêz û dibêje ez bendewarê hebûna xwe me, heye li holê. Kurd êdî etimolojiya zimanê xwe, xweser lêkolîn dikan bi hêviya axyaran ve nahêlin. Herwiha mîna her gelî, lêgerînên ekolojiya bîyolojîk xweser dikan. Bilî eniya leşkerî di nava tevgerek rôxistinî û sazgehî de, hember pirsgirêkîn têr kelem û davikan berxwedaneke mezin dikan. Ev rewş di nava hunandin û ristina dîrokî de, wê navê xwe li xwe bike û her xelekekê jê bi bawerî û daxwazek dorferehî payîdar bike. Ji ber ku ev rîwîti di nava rêcik û rîbûwarêne pirr asêgehî de tê kirin. Dîrok bê bûyer û çalekî çenâbe. Ew dabaşkirina me ya li jor, ji bo vê baweriya derbasiya ji bûyer û pêhatiyan ber bi hîmdariya gelempêri bû.

### EMBERÎ HÊZ Û RAMANEKE ÇAWA

**D**i nava çanda têr ‘tahakkumî’ de, berxwedanê mezin, hember helandin û têkçûnê dînamîzmên bi hêz û pirr zîrek pêwist in. Bêgoman ew dînamîkên bi hêz û zîrek gavavêtinên şoreşî pêktînin, ku mînakêñ wê di mercêñ îroyîn de lidarxistî ne. Yanî, di herka dîrokê de nûjeniyek dorfereh û têr bandor... Filehtî, Misilmantî, dewletên modern, kapîtalîzm û sosyalîzm... Bilî van teva ku şoreşek Kurdi hatiye lidarxistin, mîna wan tevgerên mezin, bi xurtî û mezinahiya xwe, rengekî mirov û nû, çandek nû, di nava hoy û mercêñ nû de derxistîye meydanê. Di rengê şoreşa Frensa de, ku dijberiya ‘tehekumê’ û zordestiya helandin û pûçkirinê xwe diyar dike... Xwedî derketina li çand û dîroka xwe ye, ku heya niha çand û dîroka Kurdan dibû dewlemendî û nîgariya Tirk, Ereb û Farisan... Di nava dîroka gelê Kurd de hebûnek serkêşî û hêzek xelasîya ji mirinê derxiste holê. Gavêni bi hêz, hember helandina micalkeysi û derfetîku navnîşana wê ‘qundax û singo, yanî qasatore’ bûn, bû rêvebiriya qonaxa iro. Êdî gotin û galgalên çirok û çîvanokî ketin qonaxa ‘reşbelekên’ nîrêzêrin. Bi sedan sal in ku Kurd di nava **gerdûna anamîzmê** de, di nava ‘**tiştîn ne tiştîk**’ de bûn. Weke têzanîn, ‘di nava tiştîn ne tiştîk’ de girêdanek xafeloşkî û bê têkiliyên ne **hiyerarşik** hene. Herwiha gelê ji hev belabûyi û dinava anarîzma feodalî de xeniqî... Demjiyanê berê!... Berî ku Tirk koçberî Kurdistanê û Anatolya bibin, di encam û hoyêng Kurdan yê berî destpêka şoreşê de bûn. Bi têkili û qebûlkirina misilmantiyê çavdariya di nava Kurdan, Ereban û Ruman de, hîyerarşıya anamîzmê ku parîkek di nava hunandina şamanîzmê de hebû pêkanîn. Li

darxistina hiyerarşıya ‘hêzên şer’ derketin meydanê. Herwiha, van ‘hêzên şer’ sinor û tixub nasnekirin. Ew hêzên Tirkan ku bi xêra vê pêkhatinê li rojhilata navîn bûne serkêşê sê kîşweran, hemberî şaristanî û hiyerarşıya çîn, dest nehilandin, axyarî welatên curbecur bûn û ‘etrak-i bî idrak’ bûn: ev hiyerarşî di encamek wilo dorfereh, kûr û dûr ristin û lidarxistin, xalek ji per û baskêñ xwe ji Mewlana Celaleddin Rumî heya bigihe şêx û derwêşan, giha beg û axa û mîran standin... Mîna **Cuneyd û Begdadî** dibêje: Ji hiyerarşıya şê, mele û derwêşan tiştîn paqîj, delal û têr nîgarî pişkivin. Teva jî bû mal, mewdan û tekyana dewletî ji bo Tirkan. Heya gihaye wêjeyek **Heterodosk** û kesên mîna **Behlûl, Azmî, Şîrî** bûne mal ji wan re. Herwiha kesên mîna **Baba Ishak** ku ji gundê **Keferzutê** ye, girêdayî **Midyadê** û li herema Hevêriya (Torê) ye. Serhildana wî ne mîna Tirk dibêjin e. Lê, bilî **Baba Ishak** bikin malê xwe, gereke bibêjin û xweş li ser rawestin ku rêvebiriya Selçûkî û Osmaniyan navbera xwe û medresan, dergeh û ocahan qet xera ne kiriye. Medrese, ocax ji bo erka xwe bikaranîne. Her dema navbera Osmaniyan û medresan û ocahan xera bûye ev sazgeh kirine dubend û berê wan dane hevûdin. Dar û qîfar bi hevûdin re nîşanî wan dane. Mînaka **Yawuz Selîm** ku bi darêzorê û bi devê şûr **Mekke** safî kir, di mizgefta pêxember de xutbe bi navê xwe da xwendin û xeftanê xelîfetiyê, hê dilopên xwîna mirovîn misilman ji şûrê wi diniqutîn li xwe kir: Kêlîka xutbe li ser navê wî hate xwendin hêstirêñ xwe, bi ser simbelêñ xwe yêñ boq û radyî de barandin, hember gotina melê: ‘**Sahîb-el harameyn**’, wî bi bê şermî dengê xwe kir û got: ‘**Ne sahîb-ul Harameyn, xâdim-el Harameyn**’... Cenabekî wiha dilpenah çiqasî zâlim be, destêñ wî, bilî komên xelkê, di xwîna bav û birayêñ wî de be, xem naake, hêjaye ku bibe xelîfe û padışahê sê kîşweran...(!) Herwiha **Elî Emîrî** ku ji bajarê Amedê ye û Kurd e, ferhenga **Dîwan-î Lugat-et Turk**, ji mirinê, windabûna têkçûnê xelas kiriye. Em behsa mirovîn mîna **Ziya Gokalp** û kesên di qonaxa îroyîn de ku çanda Tirkan bi şax û per kirine û di nava cîhanê de bûne ala Tirkanî nakin...

Hiyararşîyek leşkerî, olî û çandî di nava hevûdin de pêçayı, kütayî, ristî û hunayî, têr nîgar derketiye holê. Girêdanên ‘silsileyî’, yanî ocax û malbatî cihê xwe dane girêdanêñ sosyal û dewletî. Serhildana derwêşen **heterodoks** ku me li jor mînaka **Baba Ishak** da di vê derbarê de pirr balkêş e. Mîna **Şerîf Mardîn** (1) dibêje: ‘**demedor, navendi**’ hatiye

1- **Şerîf Mardîn** kurê Eb-ül ûla Mardîn e ku ji bajarê Mêrdînê ye û di damezrandina zanînageha dadî de keda wî pirr mezin e.

pêkhatin. Yanî demedor bi navendê ve hatine girêdan û ev ristin hinbihin bi hunandinek dorferehî mîna tevnepîrkê pêkhatiye ku bûye bingeha sistema Osmanî. Sîstem wilo hatiye avakirin ku di her hêlên zanistî û komaleyatî de rîwingîti ji bo navendê kar kirîye. Modela bi navê oldariya misilmantî û bi navê pêxember bû, lê pêkhatin, li gorî **a priorî** dinava avên ne diyar de ji bikêrî navendê dihatin. Li vir mînakêñ karûbarê **Barbarê Sor** ku bi navê **Barbaros** tê nas kirin û seydayê **Fatîh**, **Mola Gûranî** pirr balkêş in. Yek jê muxlacî ye, serekê muxlaciyeñ deryayî ye, ê din serekê ‘ulema’ye misilmanan e... Her du ne beru û ne mişara darekê ne... Lê, her du jî li yek dîwanê bûne bendewarî bilindgehiya Osmaniyan.

Çiqasî dîrok qat bi qat bête nijinandîn û demjiyanêñ dîrokê ji bo têgihiştinêñ têr mînak bibin ayîne, demêñ cografi û demêñ sosyal û demêñ kesayetî bêne hember hevûdin wê bêhtirîn bê dîtin ku bexçe û firazeyêñ di nava xeşim û nawîsên dîrokî de ji hev ne cuda ye û rengedarî hevûdin in. Biçûk, lê bi awirek balkêş i dijwar lê bête kolan û nêrin, çîksayıya dîrokê wê derbikeve rûerdê.

Her çiqasî Edmond Faral, bibeje, *Kuştina dîroka mezin, tîrsa mezin ji dîrokê ye* jî, li gorî min dîroka mezin tune ye. Qirkirnêñ mezin hene, xwînrija neqam heye. Heger mirovanî pêlêkirina bedenêñ mirovan û avdana axê ji xwînê û xwarina ked û mafê mirovan, di hestê gûrî û lawîrên dirrinde de ‘dîroka mezin’bibîne, bêgotin, nirxê şoreşa Kurdi qat be qat mezin dibe. Daxwazek jîndarî azad û xwedî derketina li maf û nasname... Dîroka herî mezin e. Serdar û serkêşen wê jî di nava dîroka mezin de kesêñ herî mezin têne hejmartin. Ne Skenderê Dukuloc û edroyî, ne Sezarê titileweskî dikarin qarîşa serkêşen şoreşa Kurdi ya doh û iro bikêşin. Serdarêñ mezin i cîhanê bi gişî hember hest û xwestekên xwe yên dilbizokî (ihîras), hember derfîn ûrê xwe yên birçî û hember dilzariya xwe ku birçiyê bendetiyê bû, mîna şit û aşîten serxoş komên xelkê serûbinî hevûdin kirine. Berê hespê xwe dane vê hêlê û hêla din. Cîhanek têr tîrsnakî ava kirine. Bûne teşîresa mirovaniyek têr bela û asê. Herwiha dîrokzan jî hember van teşîrîsên têr bela bûne palê avakirina zanistîya felsefeya dîrokê.

Di mercêñ wiha de mirovekî mîna **Bertolt Brecht**, bi wan xêzikîn helbestan wê çawa bibe xwedî bandor û dikaribe hemberî hêza zorê derbikeve? Dûrî hişmendî ye...

### HEWNGÎRÊN KURD DÎKARIN ÇI BIKIN Û KÎJAN RÊBÛWARAN BÎDÎN BER XWE

Du rîcik û yet şivîle derdikeve hemberî hewngîrêñ Kurd. Bi hêzên dînamîk ku komên xelkê ketine nava guhertinêñ mezin de û bendewarî, cih daye serfiraziye... Heya iro ew ava aşgerên ku bi destêñ bendewaran dihate kişandin, rawestiyan,

tevnepîrk û evnika têr bîrov girtiye ser ferêñ aşan... Êdî dewlet ne dibin xwedayê mezin re ye û kesêñ ji rî ketî ku di derbarê dewletê de gotin û galgalan dibêjin ne serxwes û sergerde ne... Rastiyek jiyanê ku yekem car ji hêla **İsmail Beşikçî** ve hate gotin û got ‘Kurdistan kolonî ye’ iro bersiva xwe di encamek enîti de, bi serdarî û serokañ û rîexistiniyek pîrhêlî de dîtiye. Daxwazêñ aborî her çiqasî tengasiyêñ asefteyî derbêxin hemberî mirovan jî, derfetêñ mezin xwe di avakirina sazgehêñ mîna enstîtu û medya mezin mîna **MED-TV** derxistîne holê. Gundiyêñ Kurd, êdî hew nivişt û bazbendokêñ têr xetreşki têxin bin balgihêñ xwe de û li çarenûsa (qeder) bê hişmendî guhdarî dîkin. Şîvîle jî, bê hêvîti ye ku hêvî bi mirovan re tunebe, tovê jîyanê kor e û tu pişkivandina pêşerojî jêderakeve. Kes tuneye ku li rê û rîbûwarêñ aşî nagare... Lê, di demjiyanâ Kurdan de bûyerên têr gîz, yên nehêni kêm bûne. Her mirovê Kurd bêhtir ji her demê, ji dest û çavêñ xwe bawer dike. Destêñ xwe, mîna kesê di nava ava neqam de û nizanibe sobahiyê, li qiram û qırşikan napeline. Ew mijâ dinava newal û geliyêñ çiyarézan de, bi bayekî xurt û tîrêjîn rojê yên berbangê re belawela bûne. Roman û çîrok, helbest û stran di nava reşa êvarî û tariya anişk û qurçikêñ odan de nayêñ nivîsandin. Kurd bi hêz bûn û ji vê hêza xwe agahdar bûne. Helbet, dîroka Kurdistanê bi demjiyanekê tenê ve nayê girêdan. Pêwistî bi kronolojiya şunewarî nîne. Çiqasî bi dorferehî lêkolîn û lêgerîn bêne çekirin baş e. Lê, dive ku qet neyê ji bir kirin ku *xwedayê dîrokê mirov in, herwiha dîrok jî xwedayî mirovan* e. Dîrokek bêdeng û bê nav rastiya gelê Kurd, jîndarî û tevgera civakî, sazgeh û dezgehan, afîrinêñ serekeyî, nûjeniya guhertînî agahdariya cîhanek giştî nake. Min di helbestek xwe de navê vê rewşê kirîye: *Bêdengî mirina jîyanê ye...* ‘iro dîroka Kurdan ji nûjen de jîndar bûye. **Claude Lîvî-Strauss** dibêje: *‘Ji ber ku her tîş dîrok e, tîştê doh hatî gotin dîrok e, tîştê berî dekikeyekê hatî gotin dîrok e.’* Vî ciwamêri dema ev gotin gotin, merc û hoyêñ gelên mîna Kurdish berçav kirine. Gelê mîna Kurdish ku hê ferhenga zimanê wî nehatiye nivîsandin, gramer û alfabeşa wî bi giştî nehatiye serrastkirin, ansiklopedî û dîroka wî bi kûr û dûrî nehatiye afîrandin, roman û çîrok û helbest û şanoya wî di nava ristina xewroşk (mîtolojîk) û folklorîk de nehatiye ristin, aborî û bazirganiya wî di nava hoyêñ neteweyatî de nehatiye sazikirin, hebûna wî, ji hêla hemberî wî ve nehatiye naskirin... Bêgoman ci bê gotin û ci bê kirin dîrok e. Rastiya dîrokê ku diyalekta demjiyanan e ji derdikeve meydane. Ev hineki rastiya **Bertolt Brecht** derdixe hole. Lê dive em xweş bizanibûn ku di demjiyanêñ dîrokê de rastî nebûye bingeha serketin û serfiraziye. Mînaka **Spartakus** di vê hêlê de pirr balkêş e. Bi xêra wê, tevgerên civakî û şûnewarî, firazeya paşerojan û lêkolîna iro tê

naskirin. Ji ber ku ev demjiyan ji hevûdin nayêن qutkirin. Lewra **Lucien Febvre** heyâ temenê xwe yê dawî jî wiha gotiye: *'Dirok zanistiya sunewarî û zanistiya dema niha ye.'* Xwes diyar dibe ku em Kurd di her hêlî de qels û misrî ne. Ne li şunewariya xwe, yanî li mîrata xwe, ne li roja xwe xwedî derketine. Bêgoman, ji ber vê çendê em Kurd nebûne xwediyê pêşerojên xwe jî. Tewanbarî û gunehkarî car din, mîna toqê xwîzîk dikeve stuwê hewngîrên Kurdan. Rewşenbir û pênuşşorêñ Kurd di binbaryâ vê encamê de hew dikarin rabin. Pêwistiya xelasî û derketina ji nava ava neqam û rawestandina di borêñ avê de heye ku bêyi xeniqandin mirov dikaribe karekî bike. Rêya sereke ku bibe ayîneya firaza hewngîrên Kurd ewe ku pêwistiya hatina cem hev û lihevkirinê bibînin, giraniya xwe deynîn meydanê û awaza xwe. Rastiya dirokê ku diyalekta demjiyanen e jî derdikeve meydanê. Ev hinekî rastiya **Bertolt Brecht** derdixe hole. Lê dive em xwes bizanibûn ku di demjiyanen dirokê de rastî nebûye bingeha serketin û serfiraziyê. Minaka **Spartakus** di vê hêlê de pirr balkêş e. Bi xêra wê, tevgerên civaki û şunewarî, firazeya paşerojan û lêkolîna iro tê naskirin. Ji ber ku ev demjiyan ji hevûdin nayêن qutkirin. Lewra **Lucien Febvre** heyâ temenê xwe yê dawî jî wiha gotiye: *'Dirok zanistiya sunewarî û zansitiya dema niha ye.'* Xwes diyar dibe ku em Kurd di her hêlî de qels û misrî ne. Ne li şunewariya xwe, yanî li mîrata xwe, ne li roja xwe xwedî derketine. Bêgoman, ji ber vê çendê em Kurd nebûne xwediyê pêşerojên xwe jî. Tewanbarî û gunehkarî car din, mîna toqê xwîzîk dikeve stuwê hewngîrên Kurdan. Rewşenbir û pênuşşorêñ Kurd di binbaryâ vê encamê de hew dikarin rabin. Pêwistiya xelasî û derketina ji nava ava neqam û rawestandina di borêñ avê de heye ku bêyi xeniqandin mirov bikaribe karekî bike. Rêya sereke ku bibe ayîneya firaza hewngîrên Kurd ewe ku pêwistiya hatina cem hev û lihevkirinê bibînin, giraniya xwe deynîn meydanê û awaza xwe bigihînin cîhanê, herwiha bigihînin rîexistinêñ xwe. Da dikarîn daberînen dirokî pêkbînin û xwe jî nava valahiye zelîqonkî ya têr tevzinokên kesayetî xelas bikin. Xwe li dora sazgeh û dezgehîn neteweyî bidin hev û dest bavêjin karêñ mezin, yên çandî ku di humandina dewletî de xerc û sîwaxa herî sereke û neteweyetê ye. Em bixwazin nexwazin jîna berdewam wê dinava perçimên gul û gulgûberkan de xemla xwe ava bike. Lewra, di nava bexeçeyî bi gul û kulîkân, bi darmêweyan xemili ye para mirovêñ ku xwe ramangî û hewngîr dihesibîne, bêhtir ji ya her kesî hebe. Ev rûmet el..

### XWE NASKIRIN Û FIRAZEYA ME

Em hinekî din bikolin û axreşka li ser rûrêda atlasa Kurdi bixepérin. Bo bêhtir xwe nas bikin û li firazeya xwe bibînin. Berî her tiştî dive ku em xwe nas bikin... Xwe naskirin, xwedî derketina li xwe ye... Ev jî dibe bingeha afirandinêñ hişmîndî yên curbecur û ntûjen... Dibe bingeha berhemîn sereke...

Têkiliyêñ Kurdan bi Ewropa re xurt in, gihaye qonaxek ku sude têde heye. Ew çanda girtî, di nava

nava hundiruwê xwe de tevger dibû, pêgiha talanî û destdirêjîyên dijminan bû, iro têkili cîhanê bûye. Ji nava hesabdânêñ navendi ber bi gerdûnê gav avêtine. Mîna çanda cîhanê ku her dem di nava şerîn navendi yên ramangî û hewngîrî de geh perepaş, geh perepêş çûne demjiyan ne bûwartine. Lê, tu deman mîna çandê cîhanê, çanda Kurdi jî, ji şunewariya xwe qut ne bû ye. Lewra karê me hêsa ye. Pêwistiya tevgerek mezin, heye. Hember qonaxa iro ku komên xelkê, cografya welat di nava guhertinêñ mezin de, hember pîkola dijmin xwe diparêze û xwedîtiyê li awazê xwe kirin e.

Qet, dive neyê ji bîr kirin ku sê navêñ Ewropa hene. Yek: Cîhana pêşketî... Pêşbaziya çand û hewngîrî, yanî ramangîrî... Du: Cîhana teknoloji... Serdestiya hêzîn mezin... Sê: Cîhana merastinê, ya mijokerî... Ev her sê nav, bi hevûdin ve girêdayî û piştgirêñ hev in. Ta ku hişmendiyek universal derdixin meydanê. Weke tê zanîn, çanda Ewropa di hêla aborî-politîk de, piştre di her şax û baskêñ jiyanê de fereh bûye, kûr bûye. Da ku giha qonaxa pêşbaziya cîhanê...

Hember vê, pêwiste ku têkçûnêñ heya iro derketine hemberî komên xelkê Kurd bibin aýına pêşerojan. Ev aýîne ji bo eniya leşkerî jî, ji bo eniya çandî jî bingeh e... Xwedî derketina li xwe, ku me li jor behsa wê kir li vir car din derdikeve hemberî me û dibe bingeha nîvîsandina dirokê. Doh, iro û niha bête nîvîsandin, bo pêşerojîn gelê Kurd ne hewqasî tarî û di nava mij û moranêñ de gelcoyî bin... Pêşketina gelê Kurd û şoreşa wî bi tevahî ye. Diroka tevahî bi rûmet û xîretê xemilandî ye. Ronesansa ku navenda dirokê li sermirov rûnand, ji bo me jî bingeh be. Da, ew xêzika ji Adem û Hawa heyâ dawîya cîhanê hatibû kifşkirin, mîna her gelê cîhanê ji bo gelê Kurd jî ne armanc be û nebe bingeh. Herwiha stana Kurdistanê di nava civakên xwedî şaristaniyêñ kevnare de rengîn e. Ev rengîn ji bo avakirina çanda hemdemî bingeha pirr bi hêz e. Ji kijan hêlê ve em li paşeroja xwe dinêrin rewş, ji hêla çandê ve, erêni (pozitîf) e. Lewra asteng dimîne mîjîyê kesan. Heger em mîjîyê xwe di nava çewtî û astengiyêñ ideolojîk de qels û pûc nekin, pêkhatinêñ me yên pêşerojan wê hemdemî bin. Pêve girêdayî, avahiya çanda Kurdan jî wê bi hêz û hêlîn hemdemî ava bibe û xwedî rûmet be. Serê her tiştî tisfaq e... Hatina ba hevûdin, serketin û pêkhatina tiştîn rûmetî ye.

Nietzsche wiha dibêje: *Heger bê daxwazkirin ku mirov bibe palevaniyê kolana gorêñ kevin, berî her tiştî dive bê zanîn ku mirov, gel û çand aşîrînêñ herî mezin in. Mirov çığası bi hêz be, şunewariyê hewqasî fereh û kûr bi xwe ve girêdide. Bi vê pêwanê jî tê zanîn ku mîrata dirokê, ji bo pêkanîna diroka mezin sînor û tixuban nasnake.*(1)

1- Friedrich Nietzsche, Felsefeyâ Dîrokê..

# BIPÊŞVEÇÛNA GOTINÊN BIYANI Dİ ZİMANÊ KURDÎ DE

***Dr. Zerdeş HACO***

Serniçke pêşî

Gava mirov bixwaze xwe nêzîkî vê mijarê bike, dive mirov rewşa taybetî ya zimanê kurmancî bêne ber çavan. Ev jî, ji ber ku rewşa zimanê kurmancî ne wek rewşa zimanên din e, bo mînak ne wek rewşa zimanê elmanî ye. Berî her tiştî dive ku em bibînin, ka ew newekheviya herî giring di nav bera zimanê kurmancî û rewşen zimanên din de çî ye? Ev yek jî di bîr û behweriya min de ew e ku ew hêza rêzanî, ya ku li pişt her zimanekî xwedî dewlet heye, li pişt zimanê kurmancî nîne. Eê ji rexekî ve dibînin ku ew dewleta Kurdan nîne, ya ku wê ji berjewendiya wê be, gava ew ji hemû zarav û devokên Kurdan zimanekî netweyî ku li seranseri Kurdistanê were bi kar anîn, bi pêş ve bibe. Ji rexê din ve em dibînin ku zimanê kurmancî li her çar parçen Kurdistanê yên dagirkirî tê bindestkirin. Ev bindestkirin jî yan bi qedexekirin û yan jî bi wê ye ku dagirker rê li ber zimanê kurmancî digirin û nahêlin ku ew bibe zimanekî fermî. Ez niha karim ku bi vê yekê min mijara xwe sînor kir, ango cihê ku ez dixwazin lê bikolim, min nîşan kir. Gava em bixwazin li ser şopên bipêşveçûna gotinên biyanî di zimanê kurmancî de herin û wan bidin xuyakirin, ji ber nebûna zimanekî kurmancî yekgirtî û bilind, tu rê li ber me nînin.. Bili ku em riyên xwe di zaraveyên serekeyên kurmancî re vekin û di wan de şopên gotinên biyanî bigirin. Ji ber vê rewşê, rêzanî û civakî di her heyamekê de li her deveke Kurdistanê ne weke hev bû û gelek caran bi wan gelên nêzîkî gelê kurd ve yan bi dagirkerên Kurdistanê ve girêdayî bû. Gotinên biyanî di kurmancî de şopên corbecor hiştine. Ev dijwariya pêşî ye, ya ku rastî mirov tê, gava ku mirov bixwaze di vî warî de bikole. Dijwariya duduwan jî, ku mirov bixwaze di warê zimanê kurmancî de bixebite, rewşa rêzaniya Kurdistanê ye. Her Kurdeki ku li her parçeyekî Kurdistanê diçe xwendegehê, di bin bandora rewşa bi du zimanan mezin dibe. Ev yek jî, giraniyeke wiha li ser zimanê kurmancî peyda dike, ku ew êdî dibe zimanê nav

mal û zimanê gundiyan tenê. Riya bipêşveçûn û xwevedanê, da bibe zimanê xwendegeh û dewletê li ber tê birîn û ew hew kare li bipêşveçûnen corecor were. Bi vê tê xuyakirin ku barguhêzî ne tenê di bin bandora têkiliya zimanan bi hev re de çêdibe. Lê çarçefa civakî û çandî jî, yên ku ew di wan de çêdibin, xwedî giringiyeke mezin in.

## 1. Zimanê Kurmancî û zimanên hawîrên wî-Nîşankirina cih

### a) Giraniya Zimanê Farisi

Zimanê kurmancî zimanekî hind û ewropî ye. Ew ji koma bakur-rojava ya zimanên Iranî ye. Ü bi vê yekê di nav zimanên hawîr de tenê di nav wî û zimanê farisi de têkiliyên merivantiyê hene.

Di pêşıya sedsala 18 an û destpêka sedsala 19 an de gava zanyarên ewropiyan di navçeya navbera her du çemên mezin, Dicle û Feratê de lêkolînên xwe dikirin, zimanê kurmancî yê ku berevajî zimanê farisi heya hingî tu lêkolîn lê ne hatibûn kirin, ber bi çavêwan ket. Heya wê demê li zimanê kurmancî seresere weke zaravek ji zaravên zimanê farisi (1) dihat temaşkirin. Belê ev behweriya han zu hate ji birkirin, gava lêkolînêji dil û zanistî ji rexê **Albert Socin, Peter Lerch, Auguste Jaba, Hugo Makas, Ferdinand Justî** û geleke din ve hatin kirin. Ji hemiyan bêhtir **Justî û Lerch** (2) bipêşveçûna serxwebûna zimanê kurmancî didin xuyakirin. Ew di lêkolînên xwe de gelek bejeyan di zimanê kurmancî de dibînin, yên ku di zimanê din yê iranî de nînin, yan jî nemane. Belê di zimanêni de yên hind û ewropî de hene. Deranîna vê rastiya han hişt, **Justî** bigîhe wê behweriyê, 'ku ne dûr e, gava mirov goman bike, ku di wan bêjeyan de kevinariya zimanê mîdî yê ku wekî dî ji nav çûye, maye.' (3) Ya rast ev e, îro hatiye diyarkirin ku zimanê kurmancî ji zimanê farisi cuda ye û bipêşveçûna wî serbixwe ye. **Lerch** (4) merivantya kurmancî û farisi halo dide zanîn: 'Qurmên her du zimanan dûrî hev in, lê her du gelek baş, çiqul û çuqılıkan hildigirin, yên ku du malan ava dîkin û kesen her du malan xwe di nav hev de nêzîkî hev dîkin û ji hev hinekî têdîgîhin.' **Lerch**, dixwaze bi vê yekê bide xuya kirin ku merivantyeke nêziktir di nav

1. Binêre li C. F. Volney di *Voyage en Syrie et en Egypte* de, yê ku di wê bîr û behweriyê de bû, ku hestuyê zimanê kurmancî farisi ye, lê hinek bêjeyen erebî û Kildanî ketine nav; weke wî jî Henry Austin Layar, yê ku di *Discoveries in the ruins of Nineveh and Babylon* de wî di wê behweriyê de bû, ku zaraveyên kurmancî weke kopkirina segetkirina zimanê farisi dibîne.

2. Ferdinand Justî, *Kurdische Grammatik*, St. Petersburg, 1880, r. VI; Albert Socin, *Die Sprache der Kurden* di GrundrîB der iranischen Philologie 1, 2, de Straßburg 1898-1901, ji r. 253 destpêdike.

3. Justî, weke li jor, r. V

4. Peter J. A. Lerch, *Forchungen über die Kurden und die iranischen Nordhelder*, Neudruck 1997 der Ausgabe St. Petersburg 1857 - 1858 r. 66

hinek zarav û devokêñ Kurmanciya Jêrîn û farisî de heye û dûriyek di nav Kurmanciya Bakur û farisî de heye. Ev nêzîkayî jî, di bin giraniya rêzanî û çandî ya ku li başûr-rojhîlatê Kurdistanê li zimanê kurmancî tê kîrn. Belê xuyaye ku giraniya ku zimanê farisî dide zimanê kurmancî di warê zimanê devkî de ne weke di warê zimanê wêjeyî de dijwar e. Lerch (1) bi taybetî li zaravêñ şeniyê Loristanê dikole û bala xwe berdide ser J. Rich, (2), Rawlinson, (3) û C. A. Bode, (4) û dibêje, hemû kesêñ ku heya niha li ser fîrsê (Farisistanê) nivîsiñe, ketine nav şâşıyeke gelek mezin, gava wan li ser zimanê Lorî û Bextiyariyan nivîsiye: Ew Kurdêñ rastî ne û bi zimanê kurmancî dipeyivin. Pirsa xwevedana zimanê farisî li rex zimanê erebî di nav huneriya kurmancî de bi sedê salan xwe di dîroka kurdî de berbipêşve biriye. Rewşenbir û dîrokvanê kurd İdrîsê Bedlîsî ‘Heşt Beheşt’ a xwe bi zimanê farisî nivîsiye. Herweke wî Şerefname de, ya ku çavkaniya dîroka kurdan ya sedsalêñ navîn e, zimanê farisî bikaraniye. Ev bandora zimanê farisî û ya zimanê erebî jî, mîna bandora zimanê fransizi di nav civaka karbîdest û malmezinê elmanan di dema Friedrikê Mezin de. Di vê demê de zimanê fransizî bû zimanê rewşenbir û gîrgirekan. Ev pirsa ha nayê wê yekê ku zimanek yê dî yekcar dinixumêne û wî jî navê radike, belê ew dide xuyakirin ku di bin hinek mercên taybetî de zimanê çandekê xwe bi wî awayî dide pêş ku helbestvan xwe lêdigirin û pê dinivîsin. Biser ku rewşenbirêñ Kurdish mîna Ehmedê Xanî hê ji mêj ve ev rewşa ha diditîn û rexen dikirin. Mixabin em heya roja iro dibînin ku nivîskar û helbestvanê Kurdish zimanê dagirkeran bikartînin, yan jî ew ji neçarî û di bin mercên bidestkirina zimanê kurmancî de bi zimanê din nivîsin, da ji bona qene, heme berhemêñ wan werin belakirin.

### b) Giraniya Zimanê Erebi

Zimanê erebî ji malbata zimanêñ samî ye û tu merivantiya wî bi zimanê kurmancî re nîne. Ji sedsala 7 an ve, angò ji dema hatina Ereban ve zimanê erebî piştî misilmankirina Kurdish bi zorê giraniyeke mezin dide zimanê kurmancî. Zanayêñ misilmanêñ Kurdish, yêñ ku di nav gel de tenê dizanîñ binivîsin û bixwînin, neçar bûbûn, berhemêñ xwe bi zimanê dewletê, bi zimanê erebî binivîsin. Giraniya zimanê erebî ji ber vê yekê û ji ber ola misilmantiyê, hema bêje dinav hemû zaravêñ kurmancî de vedaye. Tiştêñ ku li pêş derbarê giraniya zimanê farisî li ser zimanê kurdî yê wêjeyî hat gotin, li bûwara zimanê erebî û giraniya wî jî, li ser zimanê kurdî yê wêjeyî tê dîtin: Gelek rewşenbir û nivîskarêñ Kurdish berhemêñ xwe bi zimanê erebî dinivîsin, ji rexekî ve ji ber ku wan di demêñ berê de dixwestin zimanê kurmancî bi zimanê quranê û zimanê xwedê xwesbikin, ji ber ew di wê behwerye

de bûn, ku çiqas erebî bêñin nav kurmancî, hewqasî ew zimanê xwe pîroz û bilinddikin, ji rexê din ve jî, ji ber destgiraniya rêzanî ya dagirkirêñ Kurdistanê. Di zimanê kurmancî yê devkî de jî gelek bêje û gotinê erebî hene, yêñ ku hinek ji wan hatine kurdkirin.

### c) Giraniya Zimanê Tirkî

Zimanê tirkî, yê ku ji malbata zimanêñ altayî ye, weke zimanê erebî bi tu coreyî bi zimanê kurancî re ne xizm e. Giraniya zimanê tirkî li ser zimanê kurmancî dîroka bindestkirineke dijwar e. Ew bi wê daxwazîya rêzanî ve girêdayî ye, ya ku mebesta wêkuştina zimanê kurmancî ye, da li şuna wî zimanê tirkî cih bigire. Bi dirêjiya salan û neyartiyek zaneyî rêzaniya tirkî karibû, zimanê kurdî qedexe û bindest bike. Wê rêzaniya tirkêñ bê wijdan hiştiye ku beşekî mezin ji Kurdish zimanê zîkmakî yan yekcar, ji bîr bike û yan jî, hew pê biaxive. Ji bilî vê wê navê gund û bajaren Kurdistanê guherandine (5) û ji dêla wan navêñ tirkî danîne, yêñ ku tu girêdanêñ wan yê dîrokî bi wan cihan ve nîne. Rêzaniya tirkî paşnav (6) û pêşnavêñ (7) mirovîñ Kurdish, navê rêxistin û kargehêñ Kurdish qedexekirine û di ber re bi hezeran gundêñ kurdan xerakirine. Bêgoman ev agahdariyêñ han ji endamêñ vê komcivînê re ne tiştekî nû ye, ku ez dibêjim, belê daxwaza min ji bi bîranîna vê yekê ew e ku ez dixwazim di vê mijara xwe de bidim çikandin, ku bi destxistina milyonan ji kurdan û tertûbelakirina wan hêlîna zimanê kurmancî wêran dike û motika wî dimirêne. Bi vê yekê ez dixwazim bidim xuyakirin ku têkilî di nav zimanê kurmancî û zimanê tirkî de di hawîereke civakî û çandî de tê kîrin, ya ku bi rengê bindestkirina zimanê kurmancî tê xuyakirin. Gava mirov vê yekê bi rewşa mirovakî bi tenê ve girdide, tê dîtin ku ew dineçariyê de ye û dive ew zimanê zîkmakî bide paş û xwe di zimanê tirkî de bi pêş ve bibe, ji ber zimanê tirkî bitenê rê li ber wî vedike, da ew bikare di civakê de kar û cihê xwe yê li gor xwe bidest xwe ve bêne. Giraniya zimanê tirkî, ya ku bi zora dewletê tê kîrin, hiştiye ku zimanê kurmancî li ba gelek Kurdish bigîhe hejariyeke bêmînak, hjeriyeke ku digihîne mirinê, nemaze li ba wan Kurdêñ ku revîne bajaren Tîrkan.

1. Lerch, binêre li çavkaniya bîhûrî, Anhnag, r. 68-69

2. J. Rich di nameyeke ku ji Silvestre de Sacy ra bû, di Journal des Savanas de, 1821, r. 315

3. Rawlinson, di Journal of the Royal Geographical, Vol. IX, r. 105

4. C. A. Bode, di Travels in Iuristan and Arabistan, London 1845, Vol I, r. 275/276

5. Heya 01.11.1996 navêñ 12.422 gundêñ Kurdish hatine guhertin. Ev dîkin 28% ji giştiya gundan li Tîrkan iro. Binêre li:

Menschenreschte in der Turkei ‘Zur Sache, Themen parlamentarischer Beratung’ Nr. 26/90

6. Piştî durustkirina komara Tîrkan paşnavêñ Kurdish hemû kîrin tirkî.

7. Ligor zagona Nr. 1585, benda 1614 nabe ew navêñ ku bi netew û çanda tirkî re naquncin, ji rexê dewltê ve werin bikaranîn.

Rastiya ku hunermendêñ kurd ji neçarî hemû berhemên xwe û bi taybetî stranêñ xwe bi zimanê tirkî derdixin, hişt ku gelek berhemên kurdî yên gelek bilind û binirx weke huneriya çanda tirkî bê wergirtin. Vê yekê hiştîye ku hunermendiya kurdî ya berê -gotin li ser çîrokêñ wêjeyî yên corecor e- ji zanyar û lêkolîneran re hew bi zelaliyeke bêgoman were dîtin, ew tenê dikarin bêjin ku heye (1), ew berhem kurdî bin, ji ber gelê kurd di heremê de yek ji wan gelên herî kevnar e û dibe ku ew gelê ku di piştre hatibin van navçeyêñ, ew hunerî ji nû pişti hatina xwe wergirtibin. (2)

### ç) Giraniya Hin Zimanêñ Din

Ji wan zimanêñ din yên ku giraniya xwe dane zimanê kurmancî, zimanê aramî bi her du devokêñ xwe yên sereke Aşurî û Kildanî, herwekî zimanê ermenî têñ hejmartin. Têkiliya zimanê kurmancî bi van zimanan re ji hezarê salan ve ye. Ji ber bêjeran ew di kurdistanê de hebûn û niha jî hene.

Ji bilî van zimanan hemiyan divê gotin were ser zimanêñ ewropî jî, yên ku bi xwe jî giraniyeke ne hindik dane û didin zimanê kurmancî. Ji rexekî ve ji ber hin dewletiyêñ ewropiyan -heke ne demeke gelek dirêj jî be- beşin ji Kurdistanê dagirkirî bûn û ziman û çanda xwe bi xwe re tanîn, ji rexê din ve ji em dibînin ku iro hejmarek ne biçûk ji Kurdan li dewletêñ ewropayê dijin. Gelek rewşenbîrêñ Kurdan ji ber rewşa rêzanî di Kurdistanê de bazdaye û hatiye xwe li dewletêñ ewropayê girtine. Di demek weke dema me ya iro de, ku teknolgi bibezi pêş ve diçe, pêdiviya zimanê kurmancî bi koman ji gotin û bêjeyêñ nû heye, ji ber hawîre bêjerêñ zimanê kurmanî xwe li gor vê rewşa nû û bi yek lezinê diguhere. Iro gava radyo, televîzyon, rojname û kovarêñ kurdan li ewropayê behweryîñ xwe diweşînin û çap dikin, ew neçar dibin û li ser hemû babetêñ jiyanê diweşînin û dinivîsin. Bi vê yekê têkîli di nav zimanê kurmancî û zimanêñ ewropî de xurt dibe.

### 2. Bipêşveçûna gotinêñ biyanî di zimanê kurmancî de

Di vî beşê lêkolîna xwe de ez dixwazim bi mînakan bidim xuyakirin, kîjan nîşanêñ barguhaziye di riya têkiliya zimanêñ ku me li jor bi nav kirine re, di zimanê kurmancî de têne dîtin. Ji ber wê jî, ez dixwazim bidime xuyakirin, ka bipêşveçûn ber bi çi rexî ve ye. Di zanyariya zimêñ de mirov sê beşan ji hev cuda dike.

1:Barguhaziya ku di warê dengewaniyê de çêdibe...  
2:Barguhaziya ku di warê rêzimaniyê de çêdibe.  
3:Barguhaziya ku di warê bêjewaniyê de çêdibe..

### 2. I Barguhaziya di warê dengewaniyê de

Ev lêkolîn li ser wê yekê ye, ka bi çi awayî bêjerekî zimanê kurmancî dengê zimanekî dî, weke zimanê farisi, tirkî û erebî digire û li gor gera zimanê kurmancî dibîne û bilêvdike. Di dema ku em dibînin ku zimanê kurmancî hin

dengêñ erebî wergirtine, em dibînin ku dengêñ zimanê farisi, yan jî tirkî yekcar ne hatine nav zimanê kurmancî.

Ew dengêñ ku ji zimanê erebî hatine nav zaravêñ zimanê kurmancî ev in:

<u>Deng</u>	<u>mînak</u>		
h	heft	herî	hemû
s	se	sade	sal
d	derew	diwazde	pîrepind
t	teng	tari	ta
z	bazdan	hezar	zirîn
'	çe'v	re'elîn	me'în
g	bag	kagez	sag
q	qels	qul	qelş

Wergirtina dengêñ zimanê erebî vedigere ser wêjeya kurdî ya sedsalêñ navîn, gava zimanê erebî weke zimanê Xwedê dihat nasîn û helbestvanêñ Kurdan heya ji wan dihat dixwestin zimanê xwe bi zimanê Qur'an û Xwedê bineqîşînin û xweş bikin. Wan di vî karî de nêzikayıya xwe ji xwedê didit. Ew dengêñ zimanê erebî bêhtir di kurmanciya wan Kurdan de man, yên ku di pişt re jî di têkiliyeke pir de bi erebî re man.

xizmet+	kar	xizmetkar
zehmet	+ Ew dengêñ zimanê erebî,	
		yên ku me li jor bi navkirin, dengê 'q' li der iro ji zimanê kurmancî yê nivîskî hatine derxistin.

Zanyarê Kurd, Mîr Celadet Bedirxan di lêkolîna xwe de giha wê encama rast ku van dengê han di kurmancî de, ne bûne dengvan, anglo phonem û bi vê gava ku derkevin û dengêñ kurmancî vegerîne şuna xwegota bêjeyê nayê guhertin.

Em dibînin ku gava em dengêñ barguhêzêñ erebî ji 'h' û heyâ 'g' rakin û dengêñ kurmancî li şuna wan vegerînin, yek bêje gota xwe naguhere. Belê dengê 'q', yê ku di kurmancî de cihê xwe girtiye û nûye dengvan, anglo phonem hew dikare were rakirin, bê ku tevayıya gota bêjeyê were guhertin, yan jî bê ku gota wê yekcar nemêne. Bo mînak, gava em di gotina 'qul' de dengê 'q' bi dengê 'k' biguherin, 'qul' dibe 'kul'.

### 2. II Barguhêziya rêzimanî

Gava barguhaziya rêzimanî tê gotin, mebest pê ew e, ka di avayıya rêzimaniyê de, nemaza di beşen kîtewaniyê, anglo Morphologiyê, xweşbêjiyê, anglo idiomatîkêñ komewaniyê, anglo syntaxê de, çi barguhazi çêbûye.

1. Binêr li Jemal Nebez... Kommentar zu Otto Spies Artikel 'Kurdische Marchen im Rahmen der orientalisch-vergleichenden Marchenkunde' in Fabula, 15. Band, Heft 3, r. 247

2. Li ser giran, ya ku muzik û zimanê kurmancî di warêñ huneri, ziman û muzîkê de li zimanê tirkî kiriye, rûberbike: Basile Nikitine, Les Kurdes, Paris 1956, r. 136-137

Ji ber ku ev beşê barguhaziya rêzimanî, beşekî pir girêdayî ye û girêkên wî hemû hê ne vebûne, ew di zimanewaniya giştî (1) de bûye mijara herî giring, ya ku zanyarêni zimêni ser gengeşiyê dikan. Ji ber kurtiya dema ku di komcivînê de ji min re hatiye dan, ez naxwazim bikevîm ferehiyê vê mijarê, lê dîsa ji ez dixwazim wê bi çend mînakîn hinekî bidim ber ronahiyê.

## 2. II. I. Di warê pinewaniyê de (Morphologie)

Di warê pinewaniyê de mirov dibîne ku ew nişanên ne kurmancî, yên ku hatine wergirtin, di gera aşê kurmancî de li gor bandora kurmancî tênbikaranîn.

### Mînak 1

bêjeya derveyî+pinê bêjeavaker yê qurm. = bêjeya nû		
hikim	+	dar
xizmet	+	kar
kêş	+	kêş
cerib	+	andin

### Mînak 2

bêjeya derveyî+lêkera arîkar ya kurm. = Bêjeya nû		
xilas	+	kirin
fihim/fam	+	kirin
sermiş	+	kirin
anlamış	+	kirin

### Mînak 3

bêjeya kurmancî + pinê bêjeavaker yê tirk. = Bêjeya		
henek	+	cî
dikan	+	cî
mere	+	lik
	+	li

## 2. II. II Di warê komewaniyê de

### Mînak 1

Rêza gotinêni kurmancî di komekê de:  
Gava em bênen.....

#### Barguhêziya tirkî di kurmancî de:

Em bênen se

### 2. III Barguhêziya bêjeyan

Gelek awayêni barguhêziya bêjeyî hene. Bêjeyen sade, bêjeyen tev pinêni xwe, bêjeyen hevdûdanî û heyâbi biwêjan. Çend mînak:

- |                            |          |
|----------------------------|----------|
| 1. Bêjeya sade:            | zalim    |
| 2. Bêjeyen tev pinêni xwe: | dewrimci |

Di vî warî de giraniya barguhêziya zimanê tirkî û zimanê erebî li ser zimanê kurmancî gelekî bi pêş

1. Li ser vê yekê rüberbike: Uriel Weinerich, Sprachen in Kontakt, Verlag C. H. Beck München 1977, r. 49

ve çûye. Gelek caran Kurdêni ku ji başûr têni bi kurmanciyekê dipeyivin ku ji barguhaziya zimanê erebî li ber mirinê ye. Ew bi wî zimanî hew dikarin bi mirovên xwe re têkiliyê bikin. Ev nişana han bêhtir di nav rewşenbirêni wê navçeya Kurdistanê de tê dîtin. Bo mînak, kurdekî başûrê biçük di gengeşiyekê de wiha ji min re got:

*'Ew nezeriya hizbî, ew bil-ahra, ew idyolojiya hizib me irgam dike, ku em van xetewatan it-tiba' bikin.'*

Di nav van 17 bêjeyan de 6 tenê kurmancî ne, gava em wanêni xwe ducar kirine bi yekê bihijmérin.

#### di kurmancî de

- = hikimdar
- = xizmetkar
- = zehmetkêş
- = ceribandin

#### di kurmancî de

- = xilaskirin
- = fihikirin/famkirin
- = sermişkirin
- = anlamışkirin

#### nû di kurmancî de

- = henekî
- = dikanî
- = merelikî

Tiştê ku di vî warî de li ser giraniya barguhaziya zimanê erebî hat gotin, ew bixwe li ser giraniya barguhaziya zimanê tirkî ji, li ser zimanê kurmancî tê gotin. Komek û hevokêni weke vê mînakala li jêr pir xwe vedane.

**Mînak:** 'Îçê qulaqê gêndî'.

**3. Bipêşveçûna barguhêziyê di zimanê kurm. de**  
Gava mirov li pêşveçûna barguhêziyê di zimanê kurmancî de bigere û wêjeya nivîskî ya kevin bi ya nû re rüberbike, mirov dibîne ku giraniya derveyî li ser zimanê kurmancî qels dibe. Bo mînak çend malik ji helbestêni Melayê Cizîrî û yên Ehmedê Xanî, yên ku di wan de giraniya zimanê farisi û ya zimanê erebî di wê demê de têni dîtin.

**Melayê Cizîrî**

Qesida yekê:

*Heyata dil maye baqî, binoşin da bimuştqaqe  
Ela ya eyyuha s-saqî, edir kasen we nawilha  
Der axşûş çû mîared, ke ez dil caneş buspared  
Cerasê fîryadê mîdared, ke ber bendîdê muhem-milha*

**Ehmedê Xanî / Mem û Zîn, 228 - 229**

Hindî ji şêca'etê Xayûr in  
Ev xîret û ev 'lûyî him-met  
Ewçend ji min-netê nefûr in  
Bû manî 'ê hemlê barê min-net

Gava mirov zimanê kurmancî yê wê serdemê rûberî zimanê kurmancî yê nivîskî yê serdema me dike, mirov digihe wê encama zanistî ku zimanê kurmancî yê nivîskî berê xwe daye dûrkirina gotinê derveyî, ji nav xwe. Ji bo rûberînê ez dixwazim gotareke kurte kurmancî, ku di radyoya WDR li Elmanyayê, li bajarê Dordmundê 10. 12. 1996an hate weşandin bikim mînak.

'Hemû mirov bi azadî û wekehev serfiraz û bi maf hatine cîhanê. Ew bi his û újdan bîrewer in û gerek e, ku ew bi mîjîyê birayetiyyê li hev rast werin.' Ev gotina ha di benda yekê de, d, 'Daxuyaniya Giştî Ya Mafêñ Mirovan' de, ya ku 'Neteweén Yekgirtî' derxistiye, hatiye nivîsandin. Daxuyanî di 10ê çileyê paşî sala 1948an de hate blekirin: û dibin wê bizdihandinê de hate çêkirin, ya ku têrorîzma naziyan di cenga cîhanê ye didiwan de belakirin.' Gava mirov li zimanê kurmancî yê nivîskî yê serdemê kevin û serdemê nû temaşe dike, xweş tê xuyakirin ku zimanê kurmancî yê nivîskî bi ser bindestkirin û zora ku li ser heye, li rayên xwe yê binyatî vedigere. Belkî ji xwe ev bindestî û ev zorbûn, yênu ku dihêlin ku bêjerên kurmancî ji windabûna heyîna çanda xwe bitirsin û ji ber vê yekê 'dilpakiya ziman' ji xwe re dikin weke mertalekî parastinê. Di bin gotina 'dilpakiya ziman' de di zanyariya ziman ya giştî de çêl li wê yekê tê kirin, ya ku dibêje, dilpakiya ziman ew rewşa bilind ya ji xwe piştarstbûnê ye, ew rewşa ku ziman tê de weke yekgirtineke tevayî hember zimanê din peydadike û li ba mirovên xwe xwedî bilindiyeyeke taybetî ye, ew bilindiyaya ku hêjaye li ser destan were ragirtin û parastin. (1) Daxwaza ku dibêje, divê zimanê kurmancî li rayên xwe vegere, serhildaneke dide xuyakirin. Ew serhildaneke ji bo xweparastinê û li dijî zora bindestkirina ku her çar dagirkerêne Kurdistanê li dijî zimanê kurmancî bikar tênin û ew xweparastin e, ji giraniya zimanê wan. Rayên vê dilpakiyê, ne weke ku hin behwerdikin, di neteweperestiyeye çavkor de ye, belê ew di wê hestê de ye, ya ku ji xweristiyê ve di nava her mirovekî de heye. Ew hest e, ya ku her mirovekî bi zimanê dayika wî ve girêdide, bê çawa ew hê ji piçûkaniya xwe ve hîn bûye û ji ber vê yekê daxwaza wî ya xwersitî heye, ku ew zimanê dayika xwe biparêze.

Belê zimanê kurmancî weke stûneke civakî jî barê çanda civaka gelê kurd hildigire, ew zimanê hemû Kurdan e û alavê rêzanî ye, ji bo nasnameya gelê kurd were pejirandin û ji windabûnê were parastin.

1. Rûberîna nasîna gotina 'Sorachlovalîta' li ha Uziel Weinrich çavkanîya jor, r. 131 bike.

**DEMA Lİ OSTENNDE ROJ  
DİÇE AVA**

Li hêla din ya çiyê diramim  
Çavên tê yên qetranî/diranên te yên mercanî  
Li wan desten te diramim/ku çek dihilgirin  
Û ber bi ba dibe/pêşîra parqeyen te/puşîya bi ser gerdena te de dilive  
Li te sar e/tu birçiyî/tu westiyayî?...  
Dora natoriyê heya sibehî ya te ye?..  
Goman dikim dem pişî nîvê şevê ketiye  
Min dixwest dizanîbim a niha tu çi dike  
Dizanim ku hesten bi hêz mizginiya pêşerojan e  
Tu pêşerojan dizane hey gerila...  
Sibe berî rojhîlat û berî ku baran cî bide berfê  
Belkî dikarim bibim mizgîniya dema kewedanê  
Ku bibeş dikaribim hilkişim pişta çiyayên renge soreve  
Dikarim mizgîniya rojê bigihînim te  
Tu bixwaze desten min bigire/pişîtî vê dûriya  
dûvdirej/berêvarekê  
Li Ostennde kêtîka roj diçe ava/dema derya kirâsê  
renge zereve li xwe dike û qum şîl  
Weke ku ezman di nava pêtîn agir de dilerize  
Ji bo kom û liqan teva/li armancê bixin...  
Hey ji xwe hebin mirin heye/di nava sêkûckê de  
rûnîn  
Nîvê şevê di stana ezman de heyva li çardeha  
Îşev wê bazan bikujin... Di nîvê wê sêkuçkê de/  
dema welatê rojê dişewitî  
Li derdoran leşkeren ku li kozikan digerîyan  
Û laş li ber siya wan pêtîn sorgeverî man  
Berên ku ji ezman dibarîn/axa di rengê sorîşkî de  
Beza ji bo gihiştina mitik/û mirovên pîjaq kin  
Dema dem bi nîvî dibe/ temen di qermîce dikûhe  
Şevê zindanan berhemên şer in  
Dema ji ber dijmin ber bi çiyan direvin  
Di deşta şînxalî de/ketina di çolê de  
Wê kêtîka ji ezman ber dibarin  
Vietnam... Ku bi çengen şikestî şer dikirin...  
Ev gerilayên wê ne...  
Hember artêşa bi rêkûpêk ya emeriķika ku şer dikirin  
Di nava daristanek sinsîlî de ji sermayê mirin heye  
Ku tu potînên xwe jêneke û berepaş nemeş  
Serbazên artêşa emeriķika dikarin te bibînîn  
Dewsa xwe winda bike/ku lingên te bixwîn di nava  
berfê de bixelin jî  
Adrenala laşê te wê zêde bibe/belkî niha tu dilerize  
Tu di nava agirê şer de yi/ û şev ji tarî ye  
Dema tîrêjîn rojê nû nû çiya ronî kirin  
Tu yê bi berbunga sibahî re şiyar bibe/tu yê  
dikaribe têlsiza dijmin têxe desten xwe  
Tê dikaribe hevalê xwe xelas bike...  
Li çem derbas bibe/û ber bi azadiyê bibeze... Îşev

## PIRGIRÊKÊN CANDÊ

(*Nikos Svoronos*, di sala 1911 an de li Lefkoşa hatiye cihanê. Sala 1933 an de zanîngeha wêjê ya Atîna xelas kiriye. Di şerê navbera Italya û Hellen de, sala 1939 an de çekdari kiriye û hemberi dijmîn welatê xwe parastiye. Sala 1945 an çuye Fransa. Bi bursa dewleta Fransa xwendina xwe di zanîngeha Sorbonê de domandiye. Di dema xwendina xwe de ji Akademiya Atîna (1947) û piştre ji, ji hemwelatiyê hate avêtin (1955). Di sala 1961 ê de li zanîngeha Sorbonê bû profesore dîroka Bîzansê. Sala 1974 an ji, bi payedarî bû profesore Zanîngeha Atîna û Selanîk. Di derheqa dîroka Bîzans û Hellen de pîr pirtûk nivîsandine....

*Me ev nivîsandin ji, ji pirtûka wî ya bi navê *Histoire de le Grêce Moderne*, ku ji hela Panayot Abaci bi zimanê Tirkî hatiye wergerandin stand û wergerand.)*

### Nîkos SVORONOS

Di navbera salên 1856 û 1875 an de pirsgirêkên çanda Yewanistan yên giring derketin meydanê. Nîşen nû gihayî li ser van pirsgirêkan rawestiyan û li çareseriyan geriyan. Pirsgirêka bingehîn, lêgerîneke bi dorferehî li ser helenîzmê bû. Ev pirsgirêk, her dem hebû, di naveroka xwe de bi şaxêñ din ve girêdayî bû, lê belê, ya herî giring pirsgirêka ziman bû. Li ser vê pirsgirêkê hewqasî hate rawestandin ku nayê gotin. Weke ku pirsgirêkên hellenîzmê teva di vir de li hevûdin gihane hev. Di dawiya sedsala 18 an de pîrgirêka ziman mîna pirsgirêka bingehîn ya neteweyî hate dîtin û li ser hate rawestandin. **Dibistana Iyonya** ku ekoleke wêjeyî ye, li ser naverok û anîna ziman bi zexmî rawestiya, bi berhemên xwe ji, bandorek mezin li zanistên Hellen teva kir. Nîşê 1880 yi, nirxên belawela, talankirî, winda, teva bi lêgerîn kûr û dûr, li ser bingehêk zanistî rûnand. Ev, zanistiya ziman bû. Lêgerîn û lêkolîna derbarê zanistiya ziman de bi pratîkî, lê, li ser bingehê neteweyî hate çareser kîrin. Heya dawiya şerê cihanê yê duyem, zimanê gel bû bingeha çand û wêjê û wisa hate qebûl kîrin. Ev pirsgirêk heyâ iro ji, rewşenbiran bi balkêşî mijul dike. Ji bo zimanê gel bê bikaranîn û xilmet kîrin yê ku dest bi şer kîrine û gava yekem avêtine: Yek ji wan kesen sereke **Yannis Psîharîs** (1854/1929) e. **Psîharîs** zimanzanekî bi navûdeng, nivîskar û şervan bû. Di sala 1888 an, di pîrtûka wî ya bi navê **Rêwingitiya Min** de dîtinên xwe di derbarê zimanê gel de, di encamek zanistî de, vekirî û têr bawerî danî masetê. Piştî vê berhemê, di nivîsandinan teva de zimanê gel hate bikaranîn û xilmet kîrin. Lê, dive ku em vê ji nîşan bikin; berî **Psîharîs** ji, di vê derheqê de pîrtûkên zanistî hatibûn weşandin. Minakek balkêş: Profesorê ziman yê Zanîngeha Atîna **Jorj Hacîdakîs** (1848/1941) e. Her çiqasî ev mirov dijmînekî dijwar yê zimanê gel be ji, di berhemên xwe de bi kûrâyî û bi encameke zanistî li ser zimanê gel rawestiya ye... Ji ber vê çendê, bêyi dilê xwe be ji, ji bo parastin û qebûldîtina zimanê gel karekî hêja, têr kêferat kîriye. Ev xebat û kêferat bi nîşan domandiye... Di hunandin û ristina naveroka xwe ya neteweyî de her û her bûye bingeh. Ji bo qebûldîtina vê pirsgirêka bingehîn, tevgerek mezin çêbûye. Hêzên bawerî û ramangîriya Hellen ya hemdemî, helbet di nava xwe de dijberî û himbêzî, paşverî û pêşverû bi hevûdin re

dirawergirtin. **Psîharîs**, şerê ku ji bo welat hate kîrin, ji şerê derbarê ziman de dihate kîrin cuda ne dikir. Nîşê wî, bi gelemeperi di sala 1897 an de, piştî dramê têr yarı, lê çilekêşî pîrr êşyan û qolincênil dilsarî dîstine... Vî nîşî, ji dêla **îdea megâli** ku îdealek çewt û xapandinê bû, şer kîriye û bîr û baweriya welatparêziyeke rast û paqîj parastine. Ev çalekî, şerekî azadî û xweseriyê bû ku di navbera 1912 û 1914 an de dest pê kîriye, di dema gavavetina netewiyetê de ji, berdewam kîriye. Kesê vê demê yê herî navdar, helbestvan **Kostîs Palamas** (1859/1943) e. Berhemên xwe yên bi navûdeng di navbera salên 1886 /1920 an de dane. Dibistana **Iyonya** ku serkêşê wê **Solomos** e, rêberiyek mezin û hampa kîriye, li ser neteweyetê rawestiya ye. Diyar kir ku ençex neteweyetek bilind dikare di dilê Helleniyan de cihê xwe bigire û dikare rûne. Ev destpêk, hinbihin û bi evîndariyek mezin gihişte gihişte mirovaniyê... Pêwistiya karûbarê hunermendan teva di vê hêlê de diyar kîrine û xwestine... Helbestvan û nivîskarên li dora **Palamas** gihane hevûdin, dibine dibistanek. Di nava van kesan de yê herî bi hêz û xurt **Angelos Sîkelianos** (1884/1951) bû. Di berhemên wî de, dîroka Hellen ya hemdemî û berxwedanên mezin cih digirin. Ji Budîzmê bigirin heya bigîhe mistisîzma xiristiyanîyê (filehiyê) baweriyyen curbecur bi giştî, di nava **mîsterên Helleni** û tarajedyen Helleni de dane. Baweriye gelî ku bi qederê ve hişk girêdayî ye, tevger û şerê xwe di hêla civakî, sosoyal û neteweyî de, heya kîlîka dawî ya xîriqa mirinê ku ew bi xwe ji di nav de ye domandiye. Herwiha berhemên xwe di nava evîndariyê de hunayî û pêçayî, li gorî bersiva demê û pêwistiya rojê sentez kîrine û bi serkevînec mezin nivîsîne... Karûbarên pratîk, ji bo qebûldîtina di derbarê zimanê gel de, di saziyên ku sala 1905 an, bi navê **Zimanê Neteweyî** û di sala 1910 an, bi navê **Yekîtiya Perwerdeyi** û **Yekîtiya Zanîngehan** hatin damezrandin de hate kîrin. Van her sê rêxistinan polîfîka **Venîzelos** ya rewîsyonîst qebûl kîr û di sala 1917 an de **şoreşa ziman** bi ser xistin. Lê, vê şoresê xwe ne gihande her hêl û cihan. Zimanê gel tenê ji hêla nivîskar û wêjeyanan ve hate himbêz kîrin. Dewletê, dev ji zimanê maqultiyê yê kevnare berneda. Vî zimanê di perwerdeyiya navendê û bilind de erka xwe domand.

Teoriyên civakî, di sala 1875 an de ji bo çînêñ gundi û karkeran ku di hêla ramangîrî de perwerde bikin derketin holê. Lê, ev teorî ji sistemî, yanî rîkûpêkiyê dûr û xalî bûn. Derî lept û tevgerên îdeolojik yên rojava man. **Fabianizma Ingiliz, sosyalîzma Fransız û anarşîzma Italian**, bi rêyek zansitî nehatin lêkolîn kirin. Piştî demek kin, ramangîrîn sosyoalist bandora xwe nîşan kirin. Di holka politîk de, di şerê ji bo demokrasî hate dayîn de, hêzîn sosyoalist bûne xwedî erk û bandor. Herwiha serîhildana sala 1909 an derkete meydanê. Piştîrewizyonistîn liberal bi serketin û bûne xwedî erk. Aligirêna ramana sosyoalist, desten xwe dane desten kesen ku şerê zimanê gel dikin û yekîti çêkirin. Pêşî, di sala 1903 an de kovara **NUMAS** ku di dîroka nivîsandinê de cihekî wê pirr giring heye û bû gavavêtina pêkanîna wêjeya komelayetî, derxistin. Romanen civakî (sosyal), şanoyen civakî, helbesten şoşergerî, gotarêni li ser dîrokê û légerîn û lêkolînen li ser civakê, di kovara Numas de weşandin. Di pevajoya berdewama şerê cihanê yê yekem de, karûbar û xebata li ser marksîzmî dest pê kir. Di vî karûbar û xebata ku dihate kirin de hewldana marksîzmî li gorî rastiya Hellen bête lidarxistin û têkevê rojevê xuya dikir.

Livandin û lepta karê çandî, di encama ramana rojava de pêşdiyet û dihate lidarxistin. Di wêje de, carcaran di encama ‘taklîdî’ de, carcaran di hunandina xuru ya Helleni de xwe diyar dikir. Ev guftûgoyen kûr di şirove, sîrûş û rengê bergî de bi giştî xwe bi xisleteke Helleni nîşan didan. Nûnerê vê dîtinê yê herî navdar û hampa **Nîkoz**

**Kazancakis** (1882/1957) e. Berhemên wî pirr hêlîne. Ramana wî hemdemî ye... Û li ser bingeha mirovaniyê hatine hunandin: Helbestvan **Kostantîn Kawafîs** (1863/1933), di helbesta Hellen de awazek nû derdixe holê. **Kawafîs**, helbestek nû ku ji her rengê neqşî yê wêjeyî hatî şîstîn û wejartin afirandiye. Bi giştî tevlîhevî û giraniya civaka rojava kire mijar û dabaşa berhemên xwe. Ew demjiyana piştî dawiya şerê cihanê yê yekem ku têr xirûcir û pirr tevlîhev e danî ber çavan. Bal kişande ser civaka bê armanc û ji hunandinek hevgirtî û politîkî dûrketi... Ji ber ku di vê demjiyanê de pirr ramangîrîn curbecur ku têkçûna Yewanistan di di vê demjiyanê de ye derketin meydanê. **Çîzbûna** li ser bingeha tunebûnê, yan ji **kozmopolîtîka** ku ji bingeha neteweyî dûr... Hember van ramanan, komên bi giştî neteweyî yan ji komên lept û **livandina gelî** xwe diyar kirin û kar kirin. Komên ku ketin nava ramangîriya yekem, di bin bandora **Nietzsche** de man. Bingeha van komên nivîskar li ser neteweyek dijwar û digotin: *Dive ku ji bo Hellenîzmê sucede bê kirin û her wiha gelê Hellen bilind û di ser her nifşê mirovan re diditin. Aligirêna vê baweriye, bi ramanen felsefeya hemdemî xwe nûjen dikirin. Hellenîzm dixistin nava fetsînokek gevzekî mirinê de. Mercen dîrokî de pêşketina gelê*

Helleni de, ji komên xelkê yên cihanê teva divegetandin. Têkilî û danûstandin qut dikirin. Bi vê riya han Yewanistan û gelê Helleni di qata metafizîkî de dihiştin tenê. Ji mirovaniyê dûr dixistin û di baweriye tenêyî de bi rê dixistin. Li hêla din **tevgera civakî**, rastiya hellenîzmî de encamek durust de lêkolîn dikir û dibin ronahiya zanistiya komelayetî de nîşan da. Ji bo bidestxistina şaristaniyeke neteweyî ya hemdemî, tezê zanistiya komelayetî ku li ser bingeha hunerê gel û avakirinê, parastin. Wilo ji hember **mîstîzîmâ** hellenîzmî, **mîstîzîmâ** gel derkete holê.

Dawî: Ji sala 1875 an heya roja iro, hinde zanyarêن Helleni, hin pîrsîrêkên mayî çareser kirin û serkevtinê mezîn bidestxistin. (*Yewanistan, bi Yorgo Sefaris (1900/1971) xelata Nobelê standîye*) Ramangîrîn (hewngîrîn) heleni di çarçeweya pêşketina civak û politîka welat de bala xwe dane mijarêن çandî û her dem kirine dabaşa xwe. Pirr ramangîrîn cuda lêkolîn kirineû şêşketin, serkevtin û pirranî piştî şerê cihanê yê duymenî ku mercen **keşfa Ewropa** de şaristaniya neteweyî û derketina meydanê anîne ziman û danîne ber çavan.

## KIRÎVÊ MIN Î HESINKER

I/

*Di dengê naqosa dêra Mar Gabriyêl de  
Li wî cihê ku ava çeman hê tiştek kevnare ne  
kiriye*

*Di dilê bi cewhera xencerê hatî kolan de, tu  
heyî!*

*Dema Horî Numan Alêlûya ditewirand  
Bi awazên şewatî Şamoşyan tu dianîn ziman!  
Ev strana zarokên Midyadê ya herî xweş bû  
Bingeha wê ji efsaneyên me yî herî kevnar têî*

*Bi rojava re li cihê renge xemrî de tu heyî  
Piştî nîvro li mitikê çiyayêن hember  
Dema sih kete ser beroj û mesîlan de  
Di çîrisandina dilê paceyan de  
Li wê dehma latêî hinekirî  
Mîna şîrgelêkî mîrxas tu xuya dike*

II/

*Ev dengê daholê ye kirîvo ji Bircika Kaniya*

*Gulê tê*

*Xêlî di nava xemla nîgarî de ji Mizîzexê da rê  
Di dengê keçikêن ku hevalê dibejin de tu heyî!  
Dengbêj Elîko car din kirasê hevrîşim li xwe  
kiriye*

*Delingên miçekçekî, pêşîra bi neqş  
Desmala ebrûyi di stuwê wî de di lerize  
Dîlopêñ xwehdanê kirîvo bi gotinan re diweşin  
Hem dibêje hem di leyize hem li kemançê dixe  
Ji vî serê govendê heyâ bi ser din î govendê  
diçe û tê  
Di têlêñ kemança wî de kirîvo tu heyî!*

Bavê CEMBELÎ

## FEQÎR EHMED

### Helbestvanê sunewarê hozantiyê

Bi rastî nasandina Feqîr zor e. Helbesta Kurdi ya devikî ku heya îro tenê bi dengbêjan re xwe diyar kirîye, bi pêñusa Feqîr kaxezan dixemilîne. Û tiştekî ji şûnewariya xwe winda ji nake. Ku mirov dikevê nava xêzikên wî û gotinan li dûv hevûdin di hejmære, salê berê ku di kûçen oda û anîşkên berberojojan me guhdariya dengbêjîn ji civatê re digot tê bîra mirov. Mirovên wilo ku seylesof û aqilmendên gelî têne jimartin kêm in... Pirraniya wan ji medresan derketine, lê Feqîr mirovekî jinava gel derketiye û di hunandina mêtî û bedena xwe de teva ew çanda ser piyan rawergirtiye. Deng û xemla komên xelkê Kurd e... Awaz û rengînîgari û dilpênahiya folklora Kurdi ye. Feqîr bes di kevnariyê de ling nadê erdê û na bêje, gotin û galgalên xwe bi doza Kurdi ya hemdemî re dimeşîne. Cudatiyek mirxandinê ye. Ji nava gotinên wî mirovanî dirije... Lê birçî û tuyê azadiyî ye.... Evîndar e!... Evîndariya wî di her hêli de xwe digihîne kevir, kûç, av û axa Kurdistanê.. Ev nifshê helbestê pîr dewlemend e, bi rastî dewlemendiya vî nifshê helbestê li cem Feqîr ji diyar e ku heya îro 4 diwanên qeraseyî, qalin amade kirine. Roj wê bê û ne bes dengbêj û hunermendêne. Kurd helbesten wî bikin çavkanî, lêkolînvanenê Kurd ku li ser çanda gel lêkolinan bikin wê desten xwe biavêjin berhemên wî û sereke nîşan bidin. Îcar Feqîr, di roja îroyîn de ji çavkaniya hozanenê Kurd e ku bi sedan helbesten wî bûne stran... Ev encam rastiyeke diyar dike ku şûnewariya hozantiya Feqîr ditinek di cihê xwe de ye. Çanda gel bi devê gel tê kirin. Tembûr û kemança Feqîr Ehmed pêñusa wî ye. Gereke xwendevan û kesen di vî warî de xwedî gotin li ser zimanê Feqîr ne mîna niviskarekî wêjeya demê rawestin. Li gorî hunandin û ristina vî şaxê kevnare binêrin. Da ku dikaribin nirxê wî û helbesten wî nas bikin



## QEHREMANÊN KURDISTAN

Navê we pir şîrîn şêr û piling in  
Hemberî xwînvexwaran baz û şahîn in  
Ji ezman da têne jêr wekî brûsk in  
We da ber sînga xwe hemberî dijminin

Tev zana û pispor navdar û mîr in  
Şoresgerêne Kurdan pilig û şêr in  
hun hêz û partiya tev karkiranin  
Dilê min şah dibe hun qehreman in

Lê rabûne ser xwe xwedan şexsiyet  
Dijmin dişkîmin dikin bêr û şêt  
Gelê Kurdistan dibê xwedan war  
Li cîhanê deng da mîrên hêbet

## NAMUS û ŞEXSİYET CİHAN ZANÊ VÊ

Ronahiya keça Kurd wekî hîvê  
Gulfî, bisk sor in, rest li navê  
Himijin, dikelin hun wekî tavê  
Bûne brûsk têne dijminê xwe

Dest dane xortan bûne gerîlan  
Gulfî dihunan bombe li milên wan  
Kuştin û şehîdîn partiya karkiran  
Şeref û zana ne xwediyê Kurdistan

Feqîr hez dike ji nav û dengê we  
Keçê me bûn evîna dilê gelê xwe  
Namûs û iexsiyet cîhan zanê we  
Va qehremanê hêja û serokê me

## ŞAL û ŞAPIK

Min cawekî xwe kirî  
Dida yarê dibirî  
Min go şal û şapike  
Yara min berda girî

Evîna min tu ne megirî  
Naxwazî caw bi birî  
Go ne wergo lo lawo  
Lê tu çîma dişînî

Ez digirîm bi halê te  
Nikam çêkim şalê te  
Dixwazim tu jîn bibî  
Ko bibim bermaliya te

Keçê rindê jîna min  
Ronahî û tu yara min  
Şal û şapik çêbike  
Tu xwesteka dilê min

Xorto lawo jîna min  
Dergistîtu jana min  
Şal û şapik çê dikim Tu  
xwesteka dilê min

Min û yarê dest da hev  
Tev kar dikir roj û şev  
Min ji yarê maek xwest  
Lêv û can dida min tev

Em li warê evîndar  
Jiyan li ser me bû bar  
Dijmin kete warê me  
Jiyan kire tarûmar

Yarê go rabe ser xwe  
Çekan hide milên xwe  
Em dijminan derneyînîn  
Jiyan diçe ji desten me

Min go yarê jiyan xwes  
Ger em nebin bextê reş  
Va xwînvexwaran derînîn  
Bi hinir teva hêza reş

Yarê ala xwe rakir  
Sor û zerî peyda kir  
Gelî Feqîr xwe da dor  
Dijminan re şer dikir

## AZADIYA BEŞIKÇÎ Û KURDISTAN

Ala rengîn hildin em ê bidin jor  
Karker û û gundi tev da werin dor  
Amed payîtext be li hevdu rûnin  
Welat nûjen bikin aborî li jor

Ewê Kurdistan azad bibe rokê  
Tev da bibînin dema dîrokê  
Serbest û azad em ê jîn bibin  
Ji Sêwasê em ê biçin Dihokê

Ewê Kurdistan bi xêr û bêr be  
Pir î dewlemend bi zêr û zîv be  
Dicle û ferat herin Kermanşah  
Meletî û Reha balafirgeh be

Ewê Kurdistan azad be rokê  
Tev da bibînin dema dîrokê  
Serbest û azad emê jîn bibin  
Ji Sêwasê emê herin Dihokê

Xortê Kurdan herin dibistan  
Welat bihişt bê çêkin Kurdistan  
Cihan zana bin em tev azad bin  
Bijî Beşikçî û tevde Kurdistan

Ewê Kurdistan azad be rokê  
Tev da bibînin dema dîrokê  
Serbest û azad emê jîn bibînin  
Ji Sêwasê herin Dihokê

Def û zirnên xwe em tev lêxînin  
Bûka me Kurdan emê bixemîlînin  
Hinir û zana em tev herin pêş  
Dede û şêxan, feqîran gînin

Ewê Kurdistan be rokê  
Tev da bibînin dema dîrokê  
Serbest û azad emê jîn bibînin  
Ji Sêwasê emê herin Dihokê

Emê tev werin hewara Kurdistan  
Azadî deynin welat gulîstan  
Feqîr û Cegerxwîn dibe ronahî  
Silêmanî rabin werin Elbistan

Ewê Kurdistan azad be rokê  
Tevda bibînin dema dîrokê  
serbest û azad em ê jîn bibin  
Ji Sêwasê emê herin Dihokê

## QELENÊ GULÊ

Gul bihare gul gulî  
Havîn li minbihurî  
Bavê Gulê soz da min  
Qalêñ li min birî

Qelen bû hezar zêr  
Ga û golik dikir bêr  
Bi sedan pez firot  
Nekir sed û pêncî zêr

Genim û ceh tev hanî  
Milk û melal tev xanî  
Feqîr dida bavê wê  
Qelen çima der nanî

## CANA MİN

Bi xêr hatî cana min  
Li ser ser û çavên min  
Te dilê min bir û çû  
Bûyî roniya çavên min

Canê, canê, cana min  
Kulîlka nava dilê min  
Ez bûm evîndarê te  
Tu hêza min, jîna min

Were rûne tu li cem min  
Ezê maçkim çavên reş  
Tu dilê min, jîna min

Canê, canê, cana min  
Kulîlka nava dilê min  
Ez bûme evîndarê te  
Tu hêza min, jîna min

Canê dilê min xweş kir  
Rûcik li me tev ges kir  
Can û Feqîr evîndarê  
Gelê me ser bilind kir

Cane, cane, cana min  
Kulîlka nava dilê min  
Ez bûm evîndarê te  
Canê hêz i jîna min

## XWESTEKA HER DU YARAN

Xorto karê xwe bike  
Bi dil ji min hes bike  
Ez bûme evîndarê te  
Rûcik li min ges bike

Ku bibim bermaliya te  
Ezê jîne tev bidim te  
Bê te narim nava ciyan  
Can û dil tev didim te

Te çima go nabêm na  
Jîna min ji te ne cuda  
Ez rûnim ser çögên te  
Tu ramûse her du çavan

Kincêñ xweşik li xwe bikim  
Gulî û keziyêñ xwe şeh bikim  
Misk û ember tev ji min  
Serê xwe bi te bilind bikim

Tu bi mîr be, bibim jîn  
Xwe bigerîn li bejna min  
Ez û tu ji nav Berazîyan  
Tu ji Pîjan, ez ji din

Mil û Beraz bigêñ hev  
Jin û mîran bidin hev  
Keç û xortan bi hev re  
Tev şahî be roj û şev

Xort û keçik sor û zer  
Li bejna wana gewher  
Xorten ciwan simbêl reş  
Keçik lêvan bidin ser

Keçê rindê jîna min  
Tu hêz û evîna min  
Va gotinê te pir xweş  
Tu ketî nav dilê min

Dilê min te pir xweş kir  
Rûcik li me tev ges kir  
Tu gul û nêrgîza min  
Jiyan li min dirêj kir

Welatê me pir mezin  
Lê dijêñ tev mîr û jîn  
Navê te xweş Kurdistan  
Bijî, bijî tu yara min

# JI BO PÊŞEROJEKE ÇANDÎ

Kerîm M. BAQUSTANI

'Pirtûka qenc cejn e...'

Ez bi baweriye kurt dikarim bêjim ku gava M. GORKÎ, ev dîmaneya xwe ya kurtebirîn da der, dizanîbû ku pirtûk çiqas xwediyê roleke kutedayî ye, di jiyana kesatî de. Hem jî di pêvejoya çerxa civakan de... Girêdanên civakêن rojhilata navîn di hêla pirtûkan de pirr qels in. Ji xwe Kurd, ji ber gelek sedem û ajokên êdî xwiya û diyar, di nav van civakan de cihékî negatîvtir distîne... Bi giştî xwendevan weke zîvarek biçûk xwendina pirtûkê ji xwe re carekê tenê bes dîkin. Û bes dîkin... Pirtûk li ba wan tiştekî taybete, yan pêwendiyêن wan bi wê re bi awayekî xweser e... Pirtûk, li ba wan weke cixarekê, ya carekê tenê tê kişandin, yan jî weke tavek biharê ye. Lewra tu posîdeyêن bi hilim û hêz di mêmî û serîyan de na hêle.

Xwendin çalakiyek pirr babete... Ji bilî ku xwediyê ermanceke kûr û dûr e. Lî, -ev ya dawî- beravêti dibe dema ku ser rû dibe di xwestekêن lawaz yên rojane an peryodik de mirar dibe. Hîn pirtûk ne bûye elîmentekê serekî di jiyana civakên wisa de. Ji aliyê din ve, nayê ji bîrkirin ku Kurd di nav van civakan de komelgehek awarte ye û du gavan li paş e... Gavekê ji hawsî (cîran) û neteweyên serdestiyâ wê dîkin. Gavekê jî, ji cîhana rojava ya ku xwendin û pirtûk êdî xist bin bandorê metodê teknolojî yên nûjen... Hinek ji nivîskarêñ çand û wejeyan, pirr toz û icacê bi ber lingêñ xwe dixin û xizanêñ pêwendiyê kûr û zelalin. Xwendinkirin weke her karekî dibe were fîrkirin, ezberkirin, guftûgo têde çêdibin û mirov li ser têkevin nakokiyan! Mîna weke ku tekst bûye materyaleke prêmatîv ku her kes dikare, ji xwe re avahiyekî biafirîne. Ji ber vê yekê bazirganiya vî karî bû xwebînî û berpirsiyari... Bi kurtî rastiya rejayî (nisbî) ew e ku em nikarin pêwendiyên wijdanî yên ji dil û can bi tekstên xwe re datînin. Pêwiste em ji nû ve, li hemû tiştên di nav destêñ xwe de vejerin û bi hestekî ronakbîrî berçavan bikin. Heger em bizanbin wate û jêderên bingehîn yên peyvîn wêje, çand û rewşenbîrî yên, ez bawer dikim ku em ê xwe ne xapînîn bi pêşnekêşıya çandî.

Pirtûk ne milbariyeke bi zorê ye...

Xwendin bêhtir xwestekek kesatî ye...

Nivîsarî jî protestokeke kütedayî ye...

'*Ez protesto dikim -hey serok- ku wekhevî li ser rûwê erdê nîne... Ez im ev kurmê erdê li dij derdikevim, dibêjim: Na!...*' Kazancakîs, Zorba..

Em di çirava kul û kederan de digevizin. Weke sêwyan li destêñ dilovaniyê digerin ku di ser serê me re biçe û be, bi ma şah bibe... Em hîna xweliya şikestinêñ biçûk û mezin di rûwêñ xwe didin. Heger hemû ergumenêñ vî laşî di qonaxa xwepişgirî û berxwedanêñ bi rûmet de ne, dil dive hêris bike. Ji dil dihnayî û wêjeya herî bilind û har, şax û kat dide...

*'Min ji pirtûkekê re tertûbelaya wê afîrand. Pişti ku hemâ tertûbelaya wê dawiya min nanî... Lewra min jî nîvisara dirêj kir karê xwe: Çi dibe bila bibe... Ji ber ku dawiya dawî, kes guh nade ci dibe!...' Selîm Berekat.*

Pirtûk malzarokek azadiyê ye...

Xwendin hunerê berxwedana dijwariyê ye...

Di navbera pirtûk û xwendinê de xwîzik (şeytan) ronekbîrê yekemîn e, ku cihê rûmetê qezenc kir. (Na) ya wî, ya kutedayî sistemana erd û ezman wergerand. Kutedayî ermanca yekemîn e ji çanda şûnewariyek talankirî re.. Pêşiyêñ Kurdan dewlemendiya xwe talan kirin... Nijadperestan jî ew talan kirin. Bi hevûdin re ji me re bûne bar... Em jî -îro- weke mîşa LUDVING di hundirûwê şûşa cam de li qeraxan dikevin û dipekin... Dergehêñ veristinê ji ber çavan winda ne... Dive em, ji bawa serrû xwe biverisînin. Em biber demekê de diçin ku ji zarav xwe bêri dike. Dema dek, xapîn, bûyer û çîrokbejîya bê diyalog û gengesan... 'Zimanزان' û xwendevanê wêje dûrî dîtin û berçavkirina riska ku kişiya ye hinavîn zarav... Ev risk di gola zimanperestan de ye. Helbet ne barê polîtikvanan e.. Ev ji hev diyar e... Her kes xwediyê barê xwe ye. Kes bila barê xwe nexe stuwê yên din. Sibe di festîvala azadiyê de, pirs û bersiv wê kesan şîpiya rawestîne. Tevgera zarav, xwedî mîraseke bi rûmet û tewanbarî ye... Pirraniya nivîskarêñ wêje di riska mezin de diçin... Xwestekêñ kesatî di zaravê wêjeyî de risk e. Gava valahi yên zaravê wêjeyî bi kulmîn peyvîn ne bijartî û ne bêjingkirî têñ dagirtin, risk e. Suwarê ne zîrek li ser pişta hespê rehwan.. Risk e... Zaravê çand û wêje hestekî rehwan e...

Hespên rehwan jî riçmîn qutekin na pejirîne.

Wêjeyanê ne zîrek weke wî suwarî xwe bi tayêñ xav, yan jî bi werîsîn ba ve girêdide. Bayê ku hilim û bêhna biyanî ye...

Hêza wêjeyî bi pîvanek biyanî ve girêdayî ye.

Biyanîyan pêşiyêñ me talan kirin. Xizaniya me ji wê merzê ye... Xizanî bû sîma realîta me.. Lewra - dibêjin- ji bo zarav realîte razî bike. Dive zaravekî ji rehwanê xwe ter bezîn nake... Dawî, rastiyeke heye di navbera herduwan de...

Anton Gramsî, yê ku dibeje ku di navbera rewşek kevin û rewşek nû de tertûbelayek mezin tê holê... Ev rast e... Ew lawê ku gavêñ mezin li pêşîya bavê xwe nexe, ne tu law e.

Nîtsche jî, gava vê yekê dibêje... Rast dibêje!...

# REXNE Û REXNEGİRÎ

## Bedirxan EPOZDEMIR

Bi salane ku em dibêjin, rexen û rexne kirin, çeka herî giring e. Lê gelo bi rengekî zanistî me naveroka vî çekê giring fam kiriye. Weke dezgehek rexne, di sedem û pirsgirêkên me yên wêjeyî û politîkî de rola xwe ya teybetî dileyize?

Sedem, ku em bikaribin, ji astengan derbikevin û sedeman zelal bikin. Pêwiste ku em li ser vê pirsa teybetî serê xwe bi êşinîn.

Dibêjim ku rexne weke nan û avê ji me re pêwist e. Anglo rexne kîfta pirsgirêkan e. Dijê tarîtyê, ronahî ye. Rexne, gulokên benikan di pişkivîne û berhemên hêja dertîne holê.

Bêgoman, rexne bi pêkanînek zanistî tê bi kar anîn. Her kes nikare rexne û rexnegirîyê li gorî dilê xwe û pîvanêن xwe bi kar bîne. Ji ber ku di rexenê de cihê hestiyarê tune ye. Rexne, dive ku li gorî rastiyan, li gorî bingehê tevayî û di çarçeweya zanistî de bê bi kar anîn. Di rexneyan de kîn û rik tune ye. Hisiyat ji rexen re biyanî ye. Dibe ku rika te ji yekî hebe, tu lê bi hêrs be, yan jî tu bîr û baweriya wî, ramanên wî parvenekî. Ev nayên wê manê ku tu rest û çekêن xwe bavêje ser milên xwe û xwe ji êrişan re amade bike. Pêwiste tu hêsa be. Li her pirsê bi berçavikên xwe yên kesayetî ne nêre, li gorî dilê xw ne nirxîne. Dive tu bizanibe ku derî te ji nêrîn hene. Dive ku neyê ji bîr kirin ku bîr û bawerî çiqasî dûrî hev bin jî, xalêñ wekhevî û şirîk hene. Lêgerîn û zêdekirina van xalêñ wekhev û şirîk gerek e. Dive ku neyê ji bîr kirin ku tucaran, raman, bi darê zorê nehatine qebul kirin. Zor aciz bûne. Gotinêñ xirab jî, ji bê mecalbûnê têñ. Ku tu nikaribe yekî bi hêsayî û hostayî bide bawer kirin, tu dest biavêje zorê, tu çiran bike, tu tiştêñ dûrî hişmendi bibêje, tu nebûyînêñ ne ciwamêrî dike. Temâşeyî dora xwe û dûrî xwe bike, tê rastiyan bibîne.

Dek û dolap zîvirandin nabe rexne. Gotinêñ erzan bê rûmet in. Belkî ji bo demeke kurt mirov xwe bi wan gotinêñ bê rûmet bi xapîne... Lê wê dem be ku mirov şermezar bibe. Heger mirov neve ku di demêñ pêşeroj de şermezar bibe, dive gotin û dîtin baş bêne pîvan û tuqilandin. Mirov her dem kêmasiyan li cem hevalêñ xwe, rastiyê li ba xwe ne bîne. Kêmasî biçûkayî nîne, meznahî ye. Tu kî yî, çi yî, çi dike? Van pirsan her dem ji xwe bike. Bersivêñ bê layan bide. Ji bo xatirê xatiran rexne nayê kirin. Pêwiste ku mêtî serdestê rexne kirinê be. Pirraniya caran zimanê me bela serê me ye. Em bi zimanê xwe nikarin. Ziman dirêj e û bê hestî ye. Gereke ziman di bin erka mêtî de be, ne di bin erka dil de be. Gelek caran em divin ku mijgulan kil

## *REWŞ*

*Di kelê di kelê xwîna hinav  
Weke kefê difûre lê ra zirav  
Ne ken li ser lêv û ne kil li ser çav  
Newq pêçayî şal li ser hinav*

*Wek şêr e meşek kûbar  
Meş piling awir dijwar  
Her meş dikir li paş nêrîn dikir  
Xatir dikir li gund û bajar  
Li dûr li dûr dest di hilda xatir dikir*

## *XWEZÎ*

*Xwezî em jî li welatê xwe bê tirs ba ne  
Ne li derî welat bê ziman û stuxwar ba ne  
Bere em jî xwedî febrîke ba ne  
Ne li derî welat dest vegirtî ba ne  
Bere welatê me weke vaqas kesan  
bi dest me ba ne  
Ne belengaz û bi tirs ji her gotin gotin ba ne  
Ku xweziya her Kurd weke ya min ba ne  
Ji mêt de wî welat ji dest dijmin bi der ba ne*

*Mihemed Abbas*

bikin, lê çavan derdixin. Sedem jî ew e ku em nikarin hemberê xwe tewanbar bikin, ji cil newalî avê tînin. Rexne kirin, dagdeh danîn û biryar bi kar anîn nîne. Rexnevan, gereke li tewanbariyên xwedestî nîne. Rexnevan, gereke li tewanbariyên xwedestî (sunî) ne gere. Di rexnegirîyê de zikreşî û buxzî (Dexusî-bexuzî) tune ye. Reşkirin ne karê rexnevan e. Ji aliye din, rexne ne pesin û wesifdan e. Navê pesin û wesifdanê tiştekî din e. Li gorî min, her kes nikare bibe rexnevan. Ji rexnevaniyê re pisporiya pirr hêlî û zanyariyek dorferehî pêwist e. Rexnevan, dive ku bide diyar kirin ku reşkirin, pesin û wesifdan ne barê wî ye. Rexnevan, pêwist e li hemberî şâşî û kirinan de xwedî pêşniyaz be. Bi van pêşniyazan pirsgirêkan çareser bike, rê û rêuwaran veke, pêşerojan ronahî bike. Tiştek, yan jî dîtinek tenê bi serê xwe, qenc, yan jî xerab nîne. Tê de her du alî jî hene. Rexnevan, gereke başıyan bilind bike û bi nirxîne, şâşitîyan bi zanistî û ezmuneyan zelal bike, di şuna van de rastiyan bîne holê. Ku mirov ji xwe re bibêje ez rexnevan im, pêwiste ku ava bike, xera neke. Li ber tembûrê yek tarz û meqamî lê nexe, ne bêje û ne leyize. Mirov dikare li ser rexne û rexnegirîyê gelek tiştan bibêje. Lê min xwest ku vê birînê hinekî bixwerînim. Hêviya min ew e ku li ser vê babetê, em bikaribin bi hêsayî û delalî rawestin.

## MANDELE KIRINA KOR Û KERR

Mihemed QAWAS

Derwês M. FERHO

### EVÎNA JIYANÊ

*Ez diqîrim  
Bi hawar û xemî,  
ez xwîna xwe  
dikelînim  
ji bela serê me  
kevneperekîtê iroyîn re  
pirs dikim  
bi hêviyên mezin  
axa min terk bikin  
ew dayika min e*

*Ez diqîrim  
ji bo vegera wê  
şerr û girî bi kûlêñ giran  
ji sedema talana mezin  
li ser dilê şewitî  
dayika bindest û xemgîn*

*Ez aştiyê nas nakim  
bi zordariya li ser xwe  
çekêñ li dor min diteqin  
û atomêñ jînê wêran dîkin  
li nav mikêñ cîranan*

*Ez bi evîna xwe ya paqîj  
dizanim ku em hemî  
spî û reş, sor û boz  
tev li axê divegerin  
ne giring e li ku, ne jî çawa  
ne dewlemed ne jî bêwar  
ne zordar ne jî dîl  
zagona jînê weha ye*

Gelek kes hene ku naxwazin tiştekî bibihîzin û bibînin, ci rastî be, ci ji şasî be, ez dibêjim navê vê dana mandelê ye. Mandele kirineke kor û kerr... Ev bîr û baweriya wiha, bêyi xweperekîtê pê de, nabe tiştekî din. Lê ku rastî û wekhevî di hinavê wan de hebe qet mafê tu ciwamêran nadin mandelê û naxin bin lingan. Di vê mijarê de gelek tişt hene ku dive mirov li ser wan raweste û zelal bike. Da bê zanîn ku êdi komên xelkê ne di xew de ne. Dive ku bê zanîn ku em Kurd in û xwedan Kurdistanê rengîn in. Ne êrişdar û ne mafxwarin û qet ne weke hemberên xwe hov û navê me bi barbarî derneketiye. Dîroka gelê Kurd di tu deman de bi xwînxwarî nehatîye nivîsandin. Em ji welatê xwe ne revî ne û me welatê tu kesî ji destê wan negirtiye. Eger, mafê xelkê xwarin û talan kirina welatan rûmet bane, bi bîr û baweriya mirovaniye, kesek hemberî wan dernediket û seri hilnedidan. Herçiqasî di hinek babetan de diyar be jî, daxwaza min ewe ku di vê nivîsa xwe de li ser dewleta Tirk û mandele kirina wê rawestim, bê çawa çand û wêjeya Kurd tarûmar dike û li ser bi korî û kerrî rûniştiye diyar bikim. Dibêjim eger dewleta Tirk ne kor û kerr be wê guhêñ xwe bide ser hinek rastiyan û bi çavêñ vekirî baş lê temaşe bike û bibîne. Lê ji ber rûreşî û bê şermiya xwe riya mandelayê bernade. Ne dixwaze bibîne, ne dixwaze bibihîze û weki hêstirêñ mexelbûyî xwe divemidîne. Ji wan weye ku kes bi wan nizane û bilî wan her kes kor e, nabîne. her çiqasî li windakirin û ji holê rakirina çand û wêjeya kurdî bigerin jî, her dem pêwsitî biserlêdana vê çand û wêjeya dûr û kûr dîtine. Eger derew be, bila ew bibêjin û diyar bikin ku pêwistî bêjeyen kurdî nabînîn û di axaftin û nivîsa xwe de bikar nayînîn û nakin malê xwe. Hingî ne ez û ne derî min kes nikare wan tewanbar bike.

Lê, ezê çend bêjeyan weke mînak bidim diyar kirin:  
1- Kurd ji heft rojan re dibêjin yek hefte, hefteyek. Tirk dibêjin (yedî gün- bir hafta)... Niha ez ji wan dipirsim wateya hefte bi tirkî ci ye?

2- Ji Çarşemê û Pêncsemê re ci dibêjin? Wateya Çarşemê û Pêncsemê bi tirkî ci ye? Ew bi xwe dibêjin ev nav bi tirkî ne û dîkin malê xwe. Mirov hewqasî kor û kerr nabe... Dive ku mirov ji çand û wêjeya derî xwe re parîkî rîzdar be... herwiha, mirov mîna van bi sedan mînakân rîzbike. Helbet dive ku hemberên mirov ji kor û kerr be, bihêzî û mandele kirinek derfehatû neke. Tu sûda mînakân pirr tune ye, ji ber ku tirk pêça xwe nadin rastiyê, her û her gotin û galgalên kurdî ji xwe re mîna mal dibîne û zimanê kurdî dide mandelayê. Ne bes dana mandelê, nahêlin gelê Kurd bi zimanê xwe yê zîkmakî biaxive û ci di ji destê wan tê jî di derbarê qedexekirina axaftin û nivîsandina zimanê kurdî de dîkin. Hovîtiyek wiha li tu welatan nehatîye dîtin. Ew mirovê ku gemara rûwê xwe di neynikê de nebîne û beje mirovê pergî xwe rûwê te bi gemar e... Çiqasî dûrî rastî û

## Kerîm BAQUSTANI

### *WÊNEYEK*

*Bîst esumanêñ qumûti  
 ji xwe kir / û...  
 çû  
 weke ewrekî mişt kêt û şîn  
 di muzîka gavêñ xwe de  
 xilmaş bû  
 wî jî sih û pênc girî ji avekê girt  
 giriyêñ xwe hilgirt milêñ xwe / û  
 li kesî ne zîvirî  
 girî rijiya erdê bû gîlî  
 gîlî jî rojekê  
 bû gulî  
 av li ser kabokan bû tav  
 tava reben jî rojekê  
 xilmaş bû  
 ew jî weke kaniyek mişt dilan  
 û lîlîyêñ din  
 li ser qeraxêñ wan bîst bexçan  
 xilmaş bûn / û  
 bi hilm û hêz bariya  
 yek li ser dilê min  
 yek li ser kulêñ min  
 yek jî li ser xewa minî çavşîn  
 ew xewa delal  
 ji dergûşa xwe, pengizî / bû  
 kew  
 ew jî  
 di hêlinâ ba de  
 xilmaş bû / û  
 bû qurşînek din*

sozdariye be, ya tirkan jî hewqasî dûr e...

Ew û hevalbendên din ì dîbin cilê de ku tixûb û sînorêñ wan li ser hevûdin suwar bûne bi vê bawerî û rîbûwariyê xwe dixapînin. herwiha dibêjin Kurd gelekî bê ziman e... Ku em li zimanê wan binêrin ku bi sedan sal e li ser dirawestin, bi sazî û dezgehêñ neteweyî dixwazin dewlemend bikin û bi vê dewlemendiyê bersiva pêwistî û demê bikin, hemberî zimanê kurdî û dewlemendi, nîgarî û pirr hêliya wê qels û misri dimînin. Di vê xalê de, car din ezê vegereme ser her du pirsêñ xwe yên berî niha me çêlî wan kir û mînak dan. Pirsa yekemîn... Zimanê kurdî zimanekî xwezayî ye û di nava hunandina xwe de bi mercen wilo xwe ava kiriye. Pirraniya bêjeyan li gorî wateya bûyerê derketine holê. Em dikarin bibêjin ku her roj li ser taybetiya bingeha xwe rawestiyaye. Em binêrin: Kurd çima dibêjin **Şemî**, **Yekşem-î**, **Duşem-î**, **Sêşem-î**, **Çarşem-î**, **Pêncşem-î**, **În...** Bala xwe bidine ku hemî roj bi navekî pîrozî ve girêdayî ne û teva ‘î’ û **în-î** ve girêdayî ne. hemû bi wî navê pîroz ku têhniqa xwe daye cîhanê têne gotin. Ev jî pîvana girêdan û hûnandina zimanê kurdî ye. Ne tenê zimanê kurdî wiha hatiye hunandin û girêdan. Zimanê Elmanan jî di vî rengî de xwe ava kiriye û wateya rojan bûye stuna wî. Kurd xwedî zimanekî wiha dewlemend û bingeh in, lê tirk ji bo windakirin û talankirinê tinazi û qerfîn xwe dikin, herwiha dibêjin ferhenga zimanê kurdî tuneye. Ev şermî jî ya me ye ku li xwedî derketina vî zimanî bi berhem û lêkolin nakin. Pêwiste ku ferhenga kurdî bi rengekî akademik çêbibe. Bêguman zimanê kurdî dîbin axê de winda û jenga bi qirêj de ye. Lewra riya gesî û zelaliyê nabîne. Dive ku ji bin axê derbikeve û ji jenga bi qirêj û winda bê xelas kîrin. Dermanê zimanian di her hêli de pirtûk, ansiklopêdi, ferheng in.

Ji vê hevokê dîsa, weke mînakanê ku me li jor diyar kiribûn, tê gotin ku dewlemendiyâ zimanian, li ser bingeha pirr devok û zaravan tê avakirin. Di vê hêlê de zimanê kurdî bê hember e û xwedî xisleteke ku derfet bê dîtin wê nîgariyek pirr bi neqîş û xeml derbikeve holê. Dijmin vê xweş dizane, lewra heyâ ji wan tê qedexekirin û çerxa mandelê didin karkirinê. Bila baş dizanibin ku Kurd ji -Tanriyê- wan re dibêjin Xweda. Çima dibêjin Xweda?

Bila bersiva wê bidin, ji ber ku em kurd bersiva vê gotinê pirr baş û xweş dizanin. Lê xweş dizanîm ku ew nizanîn çima dibêjin -Tanri-... Weke her tiştê wan ku paşkê xwedest hatiye çekirin, bila korî û kerîtiya wan bimîne di cihê xwe de. Lê me Kurdan ew kor û kerîtiya berê ji ser xwe avêteye. Berî her tiştî edî em, li xwe, li zimanê xwe, li dirok û stana xwe xwedî derdikevin. Qet, tişteki mişeya bernadin û li mal û mafê xwe digerin. Dana mandelayê tu fêdê nade kesî.

Gotina dawî jî ewe ku ji xwendavêñ xwe re bêjim û tika (rica) bikim da li ser vê rastiya bingehîn rawestin û qet keysê nedin dijmin. Derfeten karûbar derketiye holê, rîbûwar jî pirr fereh in, ger û beza di van rûbawaran de tu astengiyan dernayêxe hemberî tu mîrxasan. Bes, dive ku bi çavdêrî û baweriye neteweyî li ser çand û wêjeya kurdî bê rawestandin. Ne bes kes û kûs... Sazî û dezgehêñ neteweyî ku karûbarê wan akademîke, dive ku balê bi xurtî bidin ser vê sedemî.

## WERE DENGÊ MIN \*

*Mehmet AKTAŞ*

Şev giran dibe...

Kaseta di alavê muzikê de çend caran ziviri? Şeroyê Biro çend caran, 'Delo gundo, xerabo gundo...' got, hew tê bira min.

Li derive şeveke tofanî ya zivistânê di lîlinê. Ferîtehêن xewê, qet nayêن ber paceya min. Ji evîndariya Biro, gotinêن birîndar i xwîn gevzêkî bi hevûdin re. 'Ez ketime ber bextê te' Gotinêن ji dil re têne gotin tevlî şevê û muzikê dibin. Dibine awaza şevê... Dibe muzikek têr kul û kederî. Demêن ku em tê de dijîn, têne guhertin...

'Lawo ez ketime ber bextê te.' Ev gotin, di zimanê me de giraniya hezar salan di hilgirin. dayikê, bêzariya xwe, êşa dilê birîndar, êşa parçê ji kezeba wê hatî jêkirin li van gotinan bar kiriye. Gotin di nava êş û kederê de hunana û bi zimanê axa xwe diaxive. Û dibêje: 'Heger hun mirov bin, ez dexîlî mirovan dibim.' Bi gotina wê, hêvî dike ku em keça wê ji destêن zaliman xelas bikin. Bang dike: 'Xwe li dengê min bigire', Di bêje: 'Li dengê min..'

Me telefon da parlamenterên Kurd ji. Me da abukat, Saziya Mafê Mirovan, me nûce gihande rojnameyan ji. Mixabin, me keça dayikê ya nexweş i edroyî (sarayı) ji destêن polisê siyasi yên Stembolê xelas nekir. Büyerên wilo êdi ji bo rojnameyên hember ji ketibûn nirkê yek stûnî. Her kes, şerê berdewam êdi, kesêن terefgîrên me ji, fêri perçiqandin, işkencê, operasyonê nîvê şevê, mirinê û windayêm gomkürî bûne. Bêxem bûne. Em teva bêxem bûne. Lê, ez nikarim vê bikim serê dayikê de. Nikarim.. Nikarim pê bidim fam kirin. Nikarim bêjim bê; 'Ew mirovaniya ku tu dexîlî dibe, fêri wê bûyera ku nîvê şevê, ji nişkê de bêن û keça te ya nexweş bibin bûye.'

Ez ê hê çiqasî dibin van gotinêن 'Ez ketime ber bextê te' de bi perçiqim. Ez ê hê çiqasî vê diljariya dayikê parvekim. Dayik, di tîrsa mezin ya vî bajarê mîna bîra bê binî û restarî de ye ku keçika wê ya nexweş bi

hêviya ku Dilşada wê ji destêن kesêن ku hember mirovaniyê eniya şer vekirine û işkencexane vekirine xelas bibe û bê de ye. Daxwaz dike ku her kes li dengê wê be û lê bi cive. Ji serma derve, ji berfê, ji dengê têlsizan, ji wan canliberên ku xeftanê mirovan li xwe kirine şikê dike. Daxwaz dike ku her kes bibe şirikê êşa dilê wê.

Dayika ku ev sê meh in ez cîrantiya wê dikim û hezar sal in ku em êş û kul û derdan parvedikin, hêviyan ji me dike. Di bêje: '*Werin dengê min, werin dengê min..*' Daxwaz dike ku her kes be û hesab ji wan kesêن gotin ku: '*Ew navnışana birayê xwe yên terorist dizane, û hatin keça nexweş di nava cihan de razayî birin.*' bi pirse. Dayika reben navê wan, zimanê wan, navnişanê wan kesêن ku Dilşad birin nizane. Bi awazek ku demê, jiyanê û ava li herik dirawestîne bang dike û dibêje: '*Keça min nexweş e, hatin birin.*' Wan kesêن ku di ber dilê wê re diçin û têن, dilê wê xweş dikin û dibêjin: '*Ser e, dijmin in..*' mina wan kesêن ku keça wê birine tewanbar dike. Parçeyê ku ji bedena wê, ji kezeba wê hatiye jêkirin û birin dixwaze. '*Dilşad*' ji devê wê der tê... Bes *Dilşad*.'

Mafê cîrantiyê, mafê mirovaniyê, mafê dayiktiyê datîne hole. Qet na xwaze, heyâ keça wê ya nexweş di destêن işkencenî de ye, qet dil nade ku kes di wan navber û sikakanre bi dileki şah û hoş biçe, bi axive, bi kene, bi gere, bi şev here ba evîndarên xwe, nan bixwe, avê vexwe û bi dileki rehet rakevin. Qet dil nade... Hember xemnexwaran, hember bê derdan, hember

temaşevanê civiyayî bi hêrs e... Di demsalek ku qet fêri ne bûyi, di jiyana xwe teva de ne difî de, bangî me, bangî her esî dike.

'Keça min paş de vegeerinîn.. Keça

min nexweş e: Keça min bê guneh e. Polisê Tirk, xwîn xwar...'

Tewanbariya Dilşad, birayê wê yê militan e, belkî ji Kurdiya wê ye. Hatibûn ku Birahîm bibin, ne li mal bû. Ew birin... Çavên wê yen kûr

bûyi, pora zer û xelekî û tenekî zer... Misrî, ziravik bû...

Nîvê şevê, dema ku tîmêن anti-teror hêris kirin hundîrû ew di nava cihêن xwe de bû. Dayika wê li ber serê wê bi tizbihêن 99 libî zikir dikirin. (Pişti ku Dilşad birin binçav kirin, dayikê dev ji hêvî û duayan berda. Bes nîfir kirin û xezeb ji zaliman re xwest. Alikariya xwedê û mirovan hêvî kir.) Pişti Kekê wê li mal ne ditin her tiş serûbiñ hev kirin û hundîrû xeremal kirin. Di navbera dayik û keçikê heyrek mezin derbas kirin û nizanîbûn kê ji wan bibin. Piştre daxwaza xwe, li ser keçika ku dibîstana destpêkê xelas kiribû rawestandin û girtin birin. Belkî ji, ku dayik biribane... Dayik hewqasî berxwe ne diket û serîhildan têr qîr û hawar ne dikir, dilê xwe ne dixist mizgeftek êş û nalêni. Ew dilê ku çiyarêzên welatê wê teva tê de bi cî dibû û bi kul û kederen hezar salan wî li hemberî wan berxwedanê bike. Heya ji wê mezbeha mirovan derketibane wî hemberî dijminê mirovaniyê ling li erdê dabane. Wî xwe kerr û lal û kor bike... Qet dengê wan ne dikir, ne diditîn, hebûna wan ji qebûl ne dikir.

Hember işkencenî ku li ser bedana wê hatibane azmun kirin teva, hiss û kerrîn jê ne dihat. Eş û qolincen derbehîşkan tu bandor lê ne dikirin. Dayik bi rojan raneza.. Ne xwar, venexwar... Bendeyî vegera keça xwe ma... Pêşî ji mirovan, piştre ji xwedê hêviyên xwe birin... Hew xwe dexîlî mirovan kir. Di paceya şevbûwîrka xwe ya bek odayî de rûnişt û nêri... Ma û hey mal... Bi rojan piştre, dema keça wê vegerandin, li ber windakirina baweri ne anîna bi nîfşê mirovan bû. Dema min got. '*Sibe wê Dilşad derbixin dadgehê, bê şik ji wê bê berdan...*' bes destêن min girtin û guvaştin. Weke ku xwest rastiyê di reşka çavên min de bibîne li nava her du çavên min nêri. Min, nûce car din bi ser xwe erê kir.

\* Ji -irtûka bi navê SESİME GEL  
hatiye wergerandin

## MIJULAHİYA HUNERMEND

*Ahmet OKTAY*

Dîrokzanê huner yê bi navûdeng **Herbert Read**, dema gotina wênekêşê modern **Klee** ku dibêje: 'Em li gel(ekî) digerin' şîrove dike wiha dibêje: 'Serlêdana hunermend ya dawî û hêja/çavkaniya civakî ye, hunera hemdemî di vê kêmasyiyê de tengijiye. İro, bi wan re û ji bo wan, bi pêhesinek civakî kirina karekî tune ye. Trajediya hunermendê hemdemî ev e.'

Pirraniya nivîskar û hunermendên nûjenparêz dem deman dibêjin pêwistî bi civakê tune ye, kêfxweşî û dilberî û himbêziya komên xelkê jî, ji kelem û hejên pêsbirkî wêdetir tu sûdê nadî. Gelo, em çewtiyekê di vê dîtinê de bibinîn, yan na? Goman dikim na... Ji ber ku çawa dîtinên zanistî yên nûjen ku ji girêdanê kevnar û tolê veqetiyayî ne, wilo jî dîtin û baweriyên hunerî di destpêkê de ji xwendevanan, guhdaran û temashevanan re tuj û pêkenokî tê. Mirov naxwaze ku 'rehetiya' wî xera bibe. Dev ji hînbûn û hinek fêribûnên xwe bernade. Nûjenî, êrişa civakî ya 'manewî' ye. Kesên ku destpêka derketina **tevgera garîb** dizanî; wê bê bîra wan ku helbesta **Orhan Welî Suleyman Efendi** çiqası dijberî rexneyên pêkenok e. Ü helbesta **Yara Min i Bi Wesîka** jî...

**Ku gruba garîb**, ji dijberiya komên xelkê mûr şikandî bûbane û paş de gav avêtibane, pêşıya **helbesta nû** wilo zu venedibû. Lê, hunermend tékoşînvan e... Helbet ev tékoşîn, nayê wê watê ku nêrin û nîrxê xwendevan qet û qet darî çavan nake. Mirov çiqasî li xwe ewle be û li gorî bîrûbaweriya xwe bimeše û tu keys nede demedoran jî, dilê wî dixwaze ku hinek mirov berhemên wî bi giranbihayî binirxînin. Tu nivîskar, tu wênekêş, tu bestekar tenê ji bo xwe berheman na afîne. Huner, danûstandina rêza herî bilind ya maqultiyê ye: Hunermend, xwedâyê gotinên ramangîrî û rêzanî ye. Ji ber vê çendê, weke ku **Klee** jî diyar dike; ku nivîskar û hunermend *li gel(ekî)* digere.

**Pirraniya nivîskar û hunermendên nûjenparêz dem deman dibêjin pêwistî bi civakê tune ye, kêfxweşî û dilberî û himbêziya komên xelkê jî, ji kelem û hejên pêsbirkî wêdetir tu sûdê nadî.**  
**Gelo, em çewtiyekê di vê dîtinê de dibînîn, yan na? Goman dikim na!... Ji ber ku çawa dîtinên kevnar û tolê veqetiyayî ne, wilo jî dîtin û baweriyên hunerî di destpêkê de ji xwendevanan, guhdaran û temashevanan re tuj û pêkonokî tê.**

Em bixwazin ne xwazin di navbera nivîskar û komên xelkê de herdem 'qonaxek' heye. Em dikarin bibêjin newekheviyek heye: Ji ber ku hunermend rekîh û çarçevan diquerêse, pêhatiyên rojane dadgeh dike, nîrxên heyî datîne holk û li ser guftûgoyan dike. Bi kurtî ku bibêjim, di her hêlî de dozparêziya xwîzik/şeytan dike. Ev jî civakê nerazî û qelqoyî, nerehet dike. Ditîrsîne... Dixwazim çend gotinên pirr balkêş yê nivîskarekî hemdemî **Jorge Luîs Borges** bigirim: Ramanê ku huner karê lihevkin û lihevhatinê bike pirr biçuk û belengaz e. Ji ber ku kes nizane bi giştî ci bike. **Kiblîng**, erê dikir ku nivîskarek bêyi payedariya xwe fam bike, dikare **fabl(ek)**ê li dar bixe. Pêwiste ku nivîskar ku li ramangîrî (hewngîrî) ya xwe ve girêdayî be. Ne ku bi rastiyek rojane, yan jî bi encamên guhertinî ve girêdayî be. Sembolên giştî her û her pêhatiyên rojane û qelqoyî daf didin û dipekînîn. Ev sembolên giştî girêdana peymanî ya nivîskar e. Sembol, bangî tiştên nehatî/nedîti lidarxistinê, tiştên nehatî/nedîti mijul kîrinê, tiştên nehatî/nedîti xeyal kîrinê dikin û didin pêş. Hebûna huner deyndarê vî tişti ye. Şik tê de tune ye. Berhemên mezin xwe pêwist dikin û dem bibûre jî dibe malê komên xelkê, tê girtin û nîrxandin. Mîna **helbesta garîban**, mîna wêneya soyut, mîna **muzika elektronîk**... Bes, dive bête zanîn ku her erê kîrin ne ji fam bûn û têgihiştinê ty. Di navbera berhem û xwendevan, temashevân de mesafeyek dimîne. Ji ber ku mijulayıya huner karekî pirr zexim û têgihiştinî ye... Bê çawa nivîskar, yan jî wênekêş di nava perwerdehî, mijulayı û pêkanînê de diçe û tê, pêwiste ku xwendevan, yan jî temashevân jî, wilo di nava berheman de biçin û bê. Berhem, pêgiha karê kolana ku qet dawî lê nayê ye...

# QELEW Û ZIRAV

**CÊXOV A. P.**

*Wergêr:Ejder*

Li stasyona xetên hesinî ya bî navê Nîkolayêv du destbirak pêrgî hev hatin. Yek ji wan qelew bû, yê din jî zirav bû. Yê qelew di wê kêlikê de li stasyonê firavîn xwaribû, lêvîn bi nîvişk seyandî weke qeresiyên gîhiştî diçîrisin. Bîna şerap û alkolê jê di fûrî. Yê zirav di wê kêlikê de ji vagona trêne peya bû, bi çente û sendoqên kertonî û bi buxçikan barkirî bû. Bîna roviyên heşandî û telpika qehwê jê diffûrî. Li paş wî, jineke misrî û çendirêj diyar bû - ew jî jina wî ye- pêre jî şagirteki GIMNAZYAYê, xortekî bejin dirêj ku xarikên çavên wî bîzorê diyar dikirin hebû - ev jî kurê wî ye.

-Porfêri! -yê qelew bi dilşahî bangkir, dema ku çavên wî li yê zirav ketin. -Gelo ev tuyî? Delalê min! Ev demeke dirêje ku me hev ne dîtiye!

-Xwedêyo! -Yê zirav behitî- Mîşa! Hevalê zaroktiyê! Tu ji kuderê ji min re derketî?

Destebirakan sê caran hevûdin hembêzkirin û bi çavên miş hêsisir li hev nerîn, her du jî bi şérînî di cihê xwe de behitî mabûn.

-Delalê min! -Pişti hembêzkirinê yê zirav dest bi axavtinê kir. Tu carî ne li bala min bû! Ev ji min re surprizek bû! Hêy!... Hêy!... Ka baş li min binêre! Tu hîna weke berê ciwanî, tu nehatî guhertin. Weke berê hestiyar û li xwe miqatekerî! Oy xwedêyo! Bêje tu di çi rewşê de yî? Dewlemendî? Bi jînî? Ez bixwe weke çawa tu dibînî, bi jinim... Eve jina min, Lûyza, ji malbata Vantsênbaxiya ye û Lûterî ye... Ev jî kurê mine, navê wî Nafanayîl e, şagirtê sala sêyemîn e. Nafanayîlê min... Ev hevalê zaroktiya mine! Li Gimnazyayê me bi hev re dixwend.

Nafanayîl kêlikê pûnijî û kûmê xwe ji ser serê xwe rakir.

-Li Gimnazyayê me bi hev re dixwend! -Yê zirav berdewam kir. Tê bîra te dema ku zarokan qerf bi te dikirin? Ji te re digorin Hérostrat, ji ber ku te pirtûkeke dibistanê bi quncika cixarê şewitandibû, û ji min re digitin Efyalt, ji ber ku min qellacî dikir. Ho!... Ho!... Ho!... Em zarok bûn! Nafnayîlê min, ne tirse, were hinekî nêzîkî wî bibe... Ev jî jina min e... Ji malbata Vansenbaxiya ye... Û Luterî ye... Nafanayîl kêlikê pûnijî û li paş bavo xwe veşart.

-De vêca bêje, dosto, tu çawa diji?.. -yê qelew bi dilşahî li hevalê xwe nêrî. Tu li tu deveran dixebeitî? Yan te xebata xwe qedandiye?

-Ez dixebeitim delalê min! Ev sala duyemîn e ku ez karmendê kolêjê me û min xelata Stanislav jî wergirtiye. Diravan kêm didin lê xwedê bi wan re be! Jina min dersên muzîkê dide, ez jî di ber karê xwe re qotiyên çıxaran ji textikan çedikim, qotiyên

yemanin! Ez yeka wan bi rûbilekî difiroşim, heger bêhtirî deh liban bixwazin... Ez wan bi erzanî difiroşim, çawa be jî diqedê. Tu dizane ku ez di Départamentê de jî xebitîm. Niha cihê karê min guhastin vêderê. Ezê li vêderê bixebitim. Bêje tu çi dikê? Diyare tu bûyi şêwirmend? Haa?

-Na delalê min, hîna bi jor de here. -Yê qelew axivî- û wiha berdewam kir:

-Xebata min gîhaye ta pêpaska şêwirmendê nehêniyê... Du stêrikên min hene.

Yê zirav sor û zer bû, di cihê xwe de hişk ma, rûwê wî bi her hêlî ve xwaromaro bû, weke çawa ku çirisk ji rû û çavên wî derkevin. Pişta wî xûz bû, lê teng hat, girêkî bû... Çente û buxçik û sendoqên kertonî jî qermicîn û ber bi hev de bizivîn... Çena jina wî ya dirêj, dirêjtir bû. Nefanayîl jî weke sing di cihê xwe de rawestiya û pişkokên qutikê xwe girtin.

-Payeberzê hêja... Ez gelekî şâ me ku hevalê min yê zaroktiyê ji nişka ve bû mirovekî giring! Hî hi hi!

-De bes e heyra! -Yê qelew eniya xwe qermicand-Çima tu bi vî awayî dipeyivê? Em hevalê zaroktiyê ne, ev rêzgirtina zêde ne pêwiste.

-Çawaaa! Nabee! -Yê zirav xwe guvaşt û di berxwe de kenî-Miqatebüna payeberzekî mîna we mirov ges dike. Ezbenî ev kurê min e, navê wî Nafanayîl e. Ev jî jina min e, Lûyza... Ta radeyekê Lûterî ye... Yê qelew xwest tiştekî bibêje, lê şadûmanî û şérînî û rêzgirtina tîrş ya ku li ser eniya yê zirav hatibû nîvisandin, vereşıya şêwirmendê nehêniyê anî. Yê qelew berê xwe ji yê zirav guhert û destê xwe dirêjî wî kir da ku xatir jê bixwaze.

Yê zirav sê tilik guvaştin û bi dirêjiya laşê xwe, xwe li ber yê qelew daqûl kir, weke çîniyan kenî. Hî hî hî! Jina wî beşi, Nafanayîl lingê xwe bi erdê ve şexitand û kûm ji serê wî ket. Her sê jî, bi şérînî behitî man.

## JÎ BO GEL

*Îro serr e  
li ser naveroka gotinan  
ku wan digot*

*Serr giran e  
Ji ber ku wan di axaftinan de  
peyvîn xwe maske kiribûn*

*Em ku ruyê me  
li berroj û tariyê vekirî  
gotinêñ me zelal  
nebin qurbanêñ doza wan*

*Derwêş M. FERHO*

## SÊWİYÊ GUND

*Abbas M. Abbas*

Beranê cîranê, xwe ji Bavê Xurşîd berbipaş ve kişand û êrîşî wî kir. Di wê kîlikâ ku hayê wî ji bayê felekê tune bû, poşek bi himmet lê da. Poşa beran li bin zikê wî ket û bi stanê piştê ve dirêjî erdê kir. Hê Bavê Xurşîd di halê xerab de, beran car din xwe amade kir û poşa duyemîn li dev û lêvên wî da. Rebeno li erdê dirêj bê hiş ket, ma. Du roj ne qedian Bavê Xurşîd mir. Jin û Xurşîdê du salî, mane bê kes û kûs. Ne pis û ne pismam... Dayika Xurşîd bi delaliya xwe jî ne hewqası darî çav bû, ne jî maldar... Da ku ber çavên hinekan bikeve. Ji ber ve çendê ma jinbî... Ne kesi temê xwe berdayî û xwest, ne wê mér ji xwe re kire mijulayî. Li ser Xurşîd ma, kar kir, virde bezî, wirde bezî xwedî kir, heyâ bû xort. Xurşîd hé di zarokatiya xwe de hînî pîrî tiştan bûbû. Ji çêkirina bisiklîteki ji hevûdin ketî, heyâ bigihe saeteke xerabe... Û çi karûbarê ku gundiyan dabane ber, na têde tune bû. Rastî jî, çi kar di nav destêن gundiyan de xerbili ba ne bangî Xurşîdê sêwî dikirin. Wî jî qet dilê gundiyan ne dişikand û dibezi alikariyê... Dayika wî jî ji vê rewşê pîr kîfîxwêş û dilşah bû û digot: 'Bo Xurşîdê min fêri karûbar bibe...' Lê, ya rast, pêrifîşaniya wê bû û armanca wê jî ew bû ku dilê gundiyan xweş bibe... Ji wan ne xeyidin... Da ku Havîn hat wê û sêwîkê wê ji hatina salê bê par nehêlin. Qencî qencyî dikişine... Helbet gundi jî wan ji bir nakin... Xurşîd pênc salan di dibistana gundekî ciran de xwend. Lê, ji bêçareyi û feqîrî xwendina xwe berdewam nekir û nîkarîbû mîna hevalên xwe ji bo dibistanê biçê bajaran û li duv xwendinê bi domîne. Xurşîd bi çûna bajarê Amedê û nas kirina Felît, kire serê xwe ku mala xwe bar bikin û bibin bajêr. Piştî ku ev bawerî di dilde rûnişti ji dayika xwe re got ku kar bêhtirin li bajêr heye, razî kir û mala xwe bar kir bire bajêr. Xurşîd li ba dozparêzekî dest bi kar kir. Kar hêsa bû. Paqîj kirina bûro, çêkirina çay û qehwê bû... Di wan rojén dirêj de pîr vala dima... Karê paqîjîyê pîr ne didomand, heyâ dozparêz, ji dadgehê hatibane geh dirûniş, geh li ser xwe bi gavên hûrik digeriya. Lê, Xurşîd di demên vala de karin din didîtin û xwe mijul dikir. Rojekê, di dema ku ser masê paqîj dikir çavên wî li fotografekî di nava rûpelên kovarê de ket. Xurşît li fotograf ma xarr... Kesên di fotograf de mil dayî hev û teva di nava çekan de pêçayî bûn. Keç û xort bi hev re... Bi lez rûpelên kovarê vekirin û yeko yeko li wan nêri. Çi fotografê dit û bi balkêşî li wan nêri. Dawî dest bi xwendina di kovarê de kir. Çiqasî xwend fêde ne kir... Kir û ne kir tê ne gihiş bê ew nîvisandin ci dibêjin. Ji tipen gir heya bi hûr xwendin fêde ne kir. Pêşî fam nekir bê bi ç zimaî ye, heyâ çend gotinê nas ku her roj ew bi xwe xilmet dike dîtin, hingî têgîhişt ku kovar Kurdi ye. Bi tirs ber bi pacê çû û derve oxilme kir. Kesî hay jê tune bû, ji hatina dozparêz re ji hê pîr dem hebû.

Li ser kursî rûnişt û dest bi xwendinê kir. Hin şaş, hin rast... Dawî êş kete serê wî... Kovar danî cihê wê çû li cihê xwe rûnişt. Tebata wî ne hat, car din rabû çû rahişte kovarê, bi lez rûpelên wê berevajî hev kirin. Bêyi hemdê xwe çû ber makîneya fotokopî... Ji rûpelên bergê û bi dorê tevahiya kovar kopî kir û car din bir danî cihê wê. Wê şevê xew ne kete çavê Xurşîd. Li ber ronahiya çirayê ma heyâ berê sibehê... Hûrik hûrik û hêdî hêdî, gotin bi gotin xwend û dengê xwe bilind dikir, bo fêri xwendina Kurdî bibe... Du şev, sê şev derbas bûn... Hin bi hin xwendina Xurşîd serrasttir û baştir bû. Bi giranî be jî, di gotinan de hew dialîqi û ne diqurpandin.

Dayika wî jî nava cihêن xwe çavên xwe zûr kirin û got: 'Derengî şevêye Xurşîd, çîma tu ranazê?...' Xurşîd dilê dayika xwe ne şikand û got: 'Areke din, ez van gotinan jî ji ber bikim, ez ê râkevîm.' Dayika wî çavên xwe miç kirin û pîrsî: 'Tu çi dixwîne? Ev çend şev in te canê xwe pêre helikand..'

Xurşîd bi dengekî nerm got: 'Zimanê Kurdî...' Dayika wî çav li xew, dîsa got: 'Mem û Zînê ye?' Xurşîd li dayika xwe nêri, wilo behîfî pîrsî: 'Tu ji kuderê bi Mem û Zînê hesiya ye?' Dayikê dev li ken bersiva wî da: 'Bavê te, carekê çîroka wan ji min re gotibû.' Xurşîd bi dayika xwe şah bû û got: 'Qey we jî wilo hej ji hev dikir?' Dayika wî ne axivî. Beşîş... Bi besûşbûna wê re ronahiyat hat û li ser rûdêna wê rûnişt. Çavên xwe bal kirin... Bi bal kirina çavên wê re du hêstir ber bi hinarkên rûwê wê daketin... Lêvîn wê lerizîn, car din xwest mijarê bi guherê û gotinê ji ser bavê wî bi guhere... Xurşîd lawo te ji kuderê çîroka Mem û Zînê peyda kir?' Xurşîd hinekî bi qurebûn got:

'Ev ne çîroka Mem û Zînê ye, li ser şoresa Kurda ye...' Bi gotina Xurşîd re dayik hilçenî qot rûnişt û bi tirs pîrsî: 'Tê mala xwe xera bikê lawê min, wê te bi kujin, Tirk bê bav in.'

Xurşîd kenî û henek lê kirin: 'Kes min na kuje, heger tu ji wan re nebe sixur.' Dayika wî jê bawer kir, loma destêن xwe li ser hev danîn û bi tengezartî got: 'Ez ê çawa ji wan re bibêjim. Waweylê lawooo! Ji xwe ev ji min kêm e...' Xurşîd fam kir ku di qeşmeriya xwe de zêde çû, dayika wî jî bawer kir. Jê re ta bi derzî ve kir û got kovar ya abukat e, hewceyiya tirsê tune ye. Rabû lihêfa dayika xwe pêdekir û hin ji helbesta

mamosta Cegerxwîn ya ku wê rojê ji ber kiribû jêre xwend. Dawî ew jî kete nava livinêx xwe, hîn rûpelên kovarê li ber çavêx wî derbas dibûn, bi kenekî sivik kete xewa giran de.

Ew ne cara yekemîn bû ku abukat dihat û didit ku Xurşid bi xwendina kovarê mijul e. Dengê xwe ne dikir û di ber re derbas dibû. Vê carê abukat di ser serê wî re şipê rawestiya û fincana qehwê danî ber Xurşid û got:

‘Fermo, mamsote Xurşid...’

Xurşid veciniqî, rabû ser xwe û bi lez û di nava şermazariyê de got:

‘Bi bexşîne ezxulam... Ez, ez xulamê wî destî me, min bi bexşîne, min xwe ji bir kir...’

Abukat kenî û got:

‘Na... Na, tu baş dike, xwendin baş e... Lî, ka ji min re bibêje bê cîma tu wilqas dixwine, çi di serê te de heye?’

Xurşid milên xwe hejandin û got:

‘Ma wê çi di serê min de hebe, xwendin xweş e. Loma, ez jî dixwênim.’

Abukat kêfxwes bû û jê r e got:

‘Nabe wilo, dive ku tiştek li ber te hebe., hêviyek, yan jî daxwazek te hebe.’

Xurşid di nav axafînê de xwe ji bir kir û bi axînî got:

‘Axxx, heger ne ji dayika min buya...’

Serê xwe hejand û kenî, bêhnikkekê pêjînî û dîsa axaftna xwe berdewam kir:

‘Wellehî wê ez mezin kirim û gereke vêca ew li xwe bi pirse..’

Dozparêz dengê xwe bilind kir û got:

‘Tu çi dibêje li ser dayika xwe?’

Xurşid bi şermî axivî:

‘Ezbenî min şaf fam neke, ez bi çavekî pirr mezin li dayika xwe dinêrim, min henek kir.’

Dozparêz got:

‘Na wellehî, tu dixwaze tiştekî bike lê dayika te bûye sedema ku tu nikarî bike. Bêje min belkî ez karibim alikarya te bikim.’

Xurşid dîsa kenî û got:

‘A niha ku dayika min yekî xwe bikira, min dizanîbû ez ê çi bikim’

Dozparêz bi fermî got:

Barê dayika te li min, lê ka bibêje tê çi bike, çi armanc di serê te de heye?’

Xurşid, bi lez got:

‘Tê barê dayika min hilîne, ê çawa?’

Dozparêz kire serê wî ku dayika wî dikare di dewsa wî de kar bike û ew jî wê hay jê hebe, lê xwest ku armanca wî fam bike..’

‘Ezê bigihim şoreshê..’

Gotina xwe bi lez ji devê xwe derxist û bi lez derkete derive. Roja din saet li heşa, mîna her roj kir ku deriyê bûro veke. Lî, dozparêz derî jêre vekir.

Kezeba Xurşid qetiya, rengê wî di cih de xeyirî...

Dozparêz kenî û got derbas bibe... Xurşid bê axaftin çû dest bi karê xwe kir: Abukat bangî wî kir. Xurşid hat li ber masê rawestiya. Abuqat di odê de bi gavên hûrik di geriya. Ji nişka ve got:

‘Xurşid roja ku te rahişte kovarê û xwend, te dev jê ber nedî, mîna karekî giring û karbendiyek mezin lê kûdand, min fam kir ku tu xorhekî baş î.

Xurşid mîna ji xew hilçenê, bi lez got:

## ROJ HAT

*Rojên gezelîyê hati*

*Welat di dest ma û roj li me ne hilat*

*Roj nîne ku em na bêjin ka azadî*

*Cîhan digirî hêstir bûn Dicle û Ferat*

*Welatê min ewa xwedî du keziyan*

*Li nav welatan teva xuyayî ye*

*Deng nîne parî di qirikê naçê xwar*

*Lê roj hat ku getelî xelas bibe ji zar*

## KUBARÊ

*Kubarê tu ne kevê warê min bi hawarî*

*Tu ciwanî ne weke min por spî yextiyarî*

*Li nobê şiyar be lê temen diçe bi dîldarî*

*Weke gula bê siha ku tavik lê dijwarî*

*Mihemed Abbas*

‘Wellehî kes pê ne hesiyaye, tenê dayika min û hew.. Wê ji te re got?’

Abukat keniya û bi fermû axaftina xwe demand:

‘Na, na... Dayika te ji min re ne got, min tu dîtî û di te anî der... Roja ku te di ber karê xwe re helbesta Cegerxwîn xwend...’

Xurşid destê xwe di ser qemçika xwe re bir û anî..

‘Weyyy, wele rast e... Bi rastî helbesten wî pirr xweş in, ezbenî te jî ew xwendin?’

Abukat, serê xwe hejand û dest bi axaftina xwe kir:

‘Binêre lawê min, daxwaza te ew bû ku tê bigîhe şoreshê.’

Xurşid serê xwe hejand...

Abukat lê nêri, bêhnikkekê bêdeng ma... Piştre rahişte turekî spî, dagirtî û got:

‘Xurşid, ev tur tejî alavên pêwist in, têde pênc pirtûk û hinek pere jî hene... Here xatir ji dayika xwe bixwaze û pirr ne mîne, lê hevalek li ber dara çinarê bendeyî te ye.’

Lingê Xurşid erd ne digirtin, pirr kêfa wî hat.

Rahişte torbe û destê dozparêz hejand.

Salek û hin ji sala din jî qediya Xurşid bêdeng û bê goman bû.

Dozparêz, rojnameya wê rojê vekir û rûpelên wê berewajî hev kirin. Ji nişka ve wêneyek ber çavê wî ket. Lî nêri, qenc dêhnê xwe dayê, keniya û ji xwe re got:

‘Way lê, ev Xurşid e, navê xwe kiriye Nêçîrvan...’

Di bin wêne re helbestek dûvdirêj hebû...

Dest bi xwendina helbestê kir. Pişti hlbest xelas kir keserek kûr berda û bi kêfxwesi got:

‘Hem nêçîrvan û hem helbestvan!...’

# STRANBÊJ MIHEMED ŞÊXO

## SÊRGO

Bi dirêjbûna xwe hatibû naskirin. Pirr dirêj bû... Ji qalinbûna camên berçavikan, temtêla çavêن wî mezin, her wiha bê tirşê gir xuya dikirin. Ji êla xwe ve Mihelmî bû. Lê, kurdperwerekî dilsoz bû. Carekê, li dawetekê, leşkerên erek, bê vexwendin xwe kiribûn mîvan. Jê xwestin ku straneke erekî bibêje. Mihemed Şêxo ne got. Leşkeran kir û nekir wî ne got. Hunermendekî di prensipên xwe de hişk û bê hedan bû. Bi bêhtengiya xwe, têr yarî û henek bû. Xîzan bû... Karê wî û rastmalê wî teva deng û tembûra wî bû. Carcaran mamostayî li xwendegêhî seretayî ji dikir. Gelek rojê teng û zor derbaskirin. Rewşa wî ya aborî pirraniya caran ew diêsand. Di deng, stran û awaza wî de, dilpenahî, nezaket û dilovaniya wî ku di hunandina laşê wî de bûbû avaniya mirovantiyek tî ji bo nasnameya kurdewariy xwes xuya dikir. Deng û stranê wî, li ser guhdaran bi bandor bûn. Bêhtir ji xemgîn, zîz û bi şewat bûn. Giran, tenik û nerm dikete dil de. Naveroka stranê wî çavdêrin li ser bilindbûn û dabaşa stranê wî. Evîn, azadî û delalî û spehîtiya Kurdistan. Dema ku Mihemed Şêxo tê ziman Azade Şêrîn û Pêşkevin Em Serfirazên Milletê Kurdi têne bîra mirov û fermo em bixwînin, hin naverokên stranê Mihemed Şêxo. Naveroka bi giştî stranê wî: Nalinek tê guhê min, lê nalineke giran e. Agir berda dilê min, hemî pêt û duxan, barek da ser milê min, lê barekî giran e. Kurdistanê delalê, her kes tê min dixwaze. Gelek şox û şemalim, min deng daye dinyayê,

ev bû bîst û du sed sal li ser min, cengebazî kurdo were min bixwaze, belê bi serfirazî... Min bi xwe, gelek caran ew dîtiye û li civata wî rûniştîme, herwiha wek gelek kesan ez hatibûm gîredan bi evîn û hesret û sema ku ji hunerê wî derdihat. Min çend caran dît bê çawa xort, jin, kal, zarok hêşir barandine di nav bêdengiyekê de û bi guhdarkirina stranê wî. Teví dûrbûna wî ji stranê folklorî, lê disa ji deng û babet û awazên wî kurdibûn. Estrûmenta wî di destpêkê de tambûr bû. Paşê buzuk bikaranî. Mihemed Şêxo, di salên şoreşa Barzanî de çübû Başûrê Kurdistanê û pişti ketina şoreşê çû İranê û li wir nêzî şes heft salan ma. Li wir, bi jineke Azerî re zewicî... Mihemed Şêxo, li İranê kasêta xwe ya pêşî ku pişti çû xerîbiyê derxist û şande Başûrê Biçük. Di wê kasêtê de wiha destpêdike: Ji Mehabad, Ji kaniya xwîna şehîdan ez vê kasêtê dişînim.' Di vê kasêtê de disa ew me dibe cîhana xeyal û evîn û mirovahiyê li Kurdistanê... Di nava gotin û awazên wê kasêtê de Mihemed Şêxoyê rih nazik, dilzîz, xemcivîn û dilsozê awaz û hunera ku em li ber férbûne. Bi stranê wî û li ser pêlên dengê wî em, difirîn, li ezmanê Kurdistanê digerîyan. Dîçûne qerax û demedorên Dicle û Ferat, raserî geliyê Elî Beg dirawestiyan... Mihemed Şêxo, civaka me dixiste rêza beşen stranê ku diafirandin. *Gava li me hat, eyd û erefat roka sibê li me hilat...* Ev dil û can ji ter kir xelat, hew ji bilî wan bi destê min hat... Bi rastî, kasêtê Mihemed Şêxo, di malên hemî kesî de dihatin bihîstin. Carna min didît ku li ba hinek mirovîn erek jî kasêtên wî hebûn û lê guhdarî dikirin. Yek ji wan mirovîn erek mamostayê min bû. Ku pirr caran li dibistanê pêş xwendekaran teva digot: 'Ez gelekî ji dengê M. Şêxo hes dikim û li mal ez pirr guhdariya dengê wî dikim.'

.....  
*Ey felek bo te dinalim  
Bo çi nêrgis çilmisi  
Ew çima bextê me hoye  
Em bê dost û bê kes in  
Agirê sar vemirî  
Çav me lê ku ges bibî  
Ew buhara têhnê kuşti  
Hêvîdarim ges bibî*  
.....

Ew hunermendê gorbîşti, li ser pevv û naveroka stranê xwe dirawestiya. Her tişt ne disstrand. Yanî Mihemed Şêxo nirxek mezin dida tekst û wateyên stranê xwe. Awaz û melodiya stranê wî carna ji ba wî bi xwe bûn, carnan ji stranê Seîd Yusif, yan ji **Mehmûd Ezîz** digotin. Ji van ya dawî:  
*Debaxandî berêm sorgul, bilbil  
dikim meylê, seher giha dinalim  
ez eman leyât, felek leyât. Yan ji  
ya Seid Yusuf. Çava kilke xeml û  
xel a xwe girêde keça delal...*  
*Rabe dilê min derman bik û bêje  
delal..* Mihemed Şêxo xwedî stîlek romantîk bû, bi dengê xwe û bi stran û muzika xwe xwedî dengekî wiha bû ku qet guh jê xalî ne dibû. Dengekî wiha bû ku dikarîbû welatê mirov bi mirov şêrîn bike û hestê mirov şîyar bike. Paşeroj bi nostajî tanî ziman, welatparêzî bi tenikî û dilovaniyek nerm dixiste dilê mirov. *'Pêşkevin em serfirazin  
milletê kurdi..'* Mihemed Şêxo, di 09. 03. 1989 an de çû ser dilovaniya xwe. Lê vê carê çûnek bê veger... Dilê ku bi salane bi heskirina vî welatî tiji bûbû, bi hesreta azadiya şêrîn, bi evîndariya dilsoz ya Kurdistanê zîzî bûbû. Çû. Ü li dûv xwe bi hezaran mirov hiştin, da çavan bi hêşir, belki hêşirên dawî bû, disa deng dihat û digot: 'Ez bûme pîrê xemcivîn. Evîna te ez pîrkirim,  
agir berda hinav û çav... Hey  
zalimê... Bê bawerê...'

*Ji Jiyana Kurdên Sovyetistana berê*

## ARTİSTÊN SANKT-PETERSBURGÊ YÊN KURD

### Têmûrê XELÎL

Hemu gel, gava di hêla politîk û aboriyê de têne zérandine, dikarin keda xwe ya giranbiha bikin nava xezîna çanda cîhanê. Ev yek, herweha di hindava diroka pêşdeçûyîna çanda gelê Kurd de jî rast e. Numuneyeke darî çavan jî nivîskar, artîst û rejîsorê Kurd, yê bi nav û deng, Yilmaz Guney xwe mihacir kir û li şaristana parîsê serê xwe danî. Wî bi filmê YOL di festivala Cannes de ciyê pêşin xelata zêr stand. Lîtereturzanê Sovyetistana berê A. Zelinskî gotiye: ‘Ji bona hunermendiya rast, gelên mezin û biçûk tune ne. Di vê derecê de hemû gel weke hev in. Her yek bi curê xwe ve berbiçav e. Mirov dikare tîbûna xwe ji ava çemekî û ji şelbikê av jî bişikîne.’ Ev ji pêşdeçûna çanda Kurdên Sovyetistana berêde jî, cihê gotî dereca pêşketina artîstên Kurd de kîf e. Nav û dengê hinuka ji wan di cîhanê de belav bûye. Wek numûne, artîsta Sîrkusa Moskow Nazî Şîray... Lawê Kurd Paşa (Arsen) Polatov rejîsorê tiyatroya Yerevanê yên pandomîmê... Reqasvanê yekemîn li Grozniyê Ebduleyê Muhammed Kurdê bi eslê xwe ji Kurdistana Iranê ye. Zîna Telo dengbêja koma Gurcistanê ye. Sitrana wê ya bi nav û deng ‘Rêro’ ye... Di vê gotarê de, ezê ji we xwendevanan re, sedema artîstên şanoya bajarê Sankt-Petersburgê (Lenîngrada berê) ya opera û baleta dewletê, xwişk û bira Natêla û Vova Qasim de binivisim. Her du artîstên Kurd bineciyên bajarê Tîblîsê (Gurcistanê) bûne û weke 25 salan e ku di wî bajarê Rusya yê bedew de dimînin. Hunermendiya xwe ya ciwan û nazik jî pêşkêşî temâsevanan dîkin. Anglo, şanoya vî bajarî ku bi hezaran evîndariyê hunermendiya wê çêbûne, bi xêr û keda wan her du lawên Kurd e... Di sala 1968 an de, Natêla Qasim di zanîngeha Tîblîsê beşa xoreografiyê (balet-raqasvanî) hate qebûl kirinê. Birayê wê Vovayê Qasim wê demê 13 salî bû. Car caran diçû temâseya balet û reqasvaniya xuşka xwe. Ku weke sûravêlka çapik û çeleng dimeşiya. Duv temamkirina zanîngeha balet û reqasvanan, ew dawetî tiyatroya Tîblîsê şaxê opera û baletê kirin. Wan salan birayê wê jî, di wê zanîngehê de tê qebûl kirin. Paşkê, wisa diqewime. Ku ji bo di opera û baleta Sankt-Petersburgê de kar bike gazi Natêla dîkin, birayê wê jî pê re diçe û di zanîngeha xoreografiyayê de tê qebûl kirin. Evîndariya kar, bejin û bala Natêla ya delal li xweşîya serokê şîşman yê tiyatro diçe û heyâ iro jî di wir de karê xwe berdewam dike. Piştî temamkirina zanîngehê Vovayê Qasim jî tê wê şanoyê. Piştî bi

hatina wî ne bi tuwî dilqê Armên spartinê de û wî baleta Aram Xaçaturyan ‘Gayane’ amade kir û pêşkêş kir. Wî bi leyistika xwe ya hunerî li ser textê dilê temâsevanan rûnişt. Kovara bi navê ‘Têaralnaya jîzn’, ku li Moskow çap dibe, di hejmareka xwe de di derbar Vovayê Qasim de bi du rûpelan rawestiya û çend wêneyên wî jî weşandin. herwiha di pirr lîstikên mezin de lîstiyê... Weke baleta Adane ‘Jîzel’ di dilqê Albert Beg de û baleta Prokofiyê ‘Romeo û Julliyet’ de jî, di dilqê Romeo de leyist. Ü bû artîstê sereke yê şanoya Sant-Petersburgê.

Dema jê pirsîne bê çawa ketiye dilqê Romeo û bi wê hostayıya mezin rola xwe leyistiye, bersiva wî bûye ev: ‘Her dem vê pirsê ji min dikin. Hinek kes di dexusin û dane metel dimînin. Gilî diwê yekê ku serpêhatiya Romeo û Jullietê pirr mîna beyt û serpêhatiyê Mem Û Zîna Ehmedê Xanî ne. Bavê min Qasimê Ecem tim ev serpêhatî ji min re digot û ew bûyer û pêhatiya mezin xwes di serê min de rûnişt. Ez dixwazim ser de zêde bikim ku Ehmedê Xanî poema xwe berî Şekspîr nivîsiye. Di baletê de bes carekê li hev hatiye, ku Natêla û Vova, xuşk û bira bi hevre di dilqê sereke de bileyizin. Wan di balêta kompozîtor Teodoralis ‘Zarên Ilyada’ de leyistine. Natela û Vova her sal rojêne xwe yên hêsabinê li Tîblîsê dibûwêrin. Li cem dê û bavê xwe, di nava heval û hogirêne xwe de derbas dikin. Wilo kete derbê de ku kolektîva şanoya wan salekê hate Tîblîsê... Şanoya Çaykovskî ‘Gola Qubeqazan’ nîşan da. Vovayê Qasim di wê şanoyê de dilqê sereke bû û mîrlaw Zîgrîdda dilîst. Di derbarê lîstika wî de rojnameya Tîblîsê ‘Zarya Vostoka’ di hejmareke xwe de wiha nivîsiye: ‘Vovayê Qasim bi hezaran maşoqê teatreya operayê û balêtê zendgirî hiştin. Degme dibe ku xortek hem bejneke şitav lê be, hem aqil û jêhâtî be. Hem jî xwedî teknîka reqaseya bilind be. Herwiha jî bê quşur bireqise... Vovayê Qasim, yekî wisane ku wê şevê şabûn kire dilê bi hezaran maşoqên hunermendiyê, yên ku tameke mezin ji leyistika wî dîtin.’ Lê, rojnameyek din ya bi zimanê Tîblîsî di derbarê wê spektaklê û Vova de wiha nivîsiye: ‘Xuya ye wetenê wî -bajarê Tîblîsê- ew xorî delal î bejin bilind rind perwerde kiriye. Dema mirov li kûçê çarçiyê rêve diçe li wî dinêre, mirov hew dizane ew şer dike yan direqise...’

Belê, hetanî niha bi milyonan temâsevanan Moskow û Fransiyen, İspaniyen û Japan, Qazakistan, Awsuturalya, Latvia û Mongoliya û gelek welatên cîhanê razîbûn û dilşahiya xwe ji leyistikên xuşk û birayê Kurd nîşan dane. Ji bo hostayıya Vovayê Qasim bêhtirîn bê ber çavan, em dikarin vê bejin ku li ser gelek afişên teatro, yên ku dema gastrol ji welat der tê, li her kuçe û çarçiyêne welatên dereke dikevin bi wêneyên wan hatine xemilandin. Xwendevanên delal! Weke ku me li jor diyar kir, dost, pis û pismamên Vova û Natêla li bajarê Tîblîsê dijîn. Dê û bavê wan bextiyar in.. Malxwê, Qasimê Ecem ji zarokê xwe ve kubar û razî ye. Ku ji bo gelê xwe jî karek kiriye. Em lawên Kurda yên hejar, destanên mezintir dixwazin ku wan navê gelê xwe û welatê xwe bilind kiriye.

**D**i 7ê Sibata sala 1916 an de, dema ku Robîn Daryo ji cîhanê koçkir û çû ser dilovaniya xwe, wê çaxê cîhan bi azarkêşî û belayên şerê cîhanê yê yekemîn mijldibû. Nebalkışandina mirina helbestvanekî ji haveyna Daryo di wan deman de tiştekî normal bû.

**H**eger cîhan di wan çaxan de di rewşike bê cengî û bê derdikêşî de bana, ma gelo mirina helbestvanekî ji Nîkaragwaya ku bi zorê dihate nasîn, wê bala mirovan bikişanda?

**D**i deh saliya duyemîn ya vê sedsala me de, wêjeya Emerîka Latînî hîna derbasî rojevan nebûbû. Parzemîna Emerîka Latînî tenê weke werzekî mozan ku xwedanê wê Emerîkiyê Bakûr bûn dihate nasîn.

**D**i wan deman de navên weke Borxîs, Kortezar, Markîz û Estoryaz hîna ne dihatin nasîn. Heger mirovîkî Emerîka Latînî li cîhanê navdar bîba, ew nav esseh yê mirovîkî şoreşger bû, yan jî yê diktatorenkî bû. Teví vê yekê jî Robîn Daryo xwe derbasî nav rîska ku bibe helbestvan kir. Piştî vê yekê demedorên cîhanê yêne wêjeyî jî, xwe derbasî nav rîska ku bi çavêl lê miqatebûnê li wî binêrin.

**E**v lêmiqatebûn hişt ku di roja iro de, Daryo weke bavê fermî yê wê pengizîna ku di nîvê duyemîn ya sedsala bîstan de, ku di wêjeya Emerîka Latînî de qewimî bû, bête jimartin. Dema iro Robîn Daryo, li ser vê bingehê tê nirxandin û careke din wî dertinin meydanê û carcaran berhemên wî têne wergerandin. Xwe nêzîkirina ber bi wî ve, ji hêla mezintirin wêjeyan û helbestvanen Emerîka Latînî tê kirin. Ew ji wan re weke bavekî ku rê li pêşîya wan vekiriye tê hejmartin. Di rastiyê de jî, riya ku Robîn Daryo vekir riyeke xwaromaro bû. Dema ku wî Ehrimanen helbestê dibersivand û ji sedemên dilbijokiya wî ji rîwîtiyê û derbideriyê re, wî bixwe jî tu kîlîkan texmîn nedikir ku ew, bili têkiliyên kesayetî bi helbest û huner û Ewropa re tu tişten din damezfrîne.

**R**obîn Daryo, di sala 1867 an de, li bajarê Mîtaba li Nîkaraguayê hate dinê Xwendina xwe ya seretayî û duyemîn li ber destêñ îsayîyan qedand. Lê ji sedemên zu bîreweriya wî û zîrektiya bê sinor, Daryo dev ji xwendinê qeriya, daku dest bi karê rojnamegeriyê bike. Wê çaxî ew ber bi 15 saliya xwe ve diçû. Xebata wî, keysa gera li welatên Emerîka navîn û Emerîka basûr dayê. Herweha jî bi rojnameya LANATION a Erjentî ve weke nûçevanekî li derive hate girêdan. Destegula pêşî ya helletsan di bîst saliya xwe de weşand. Li pey vê destegulê du destegulên din derketin. Bi ya duyemîn **ŞİN** (1888) navdariyeke mezin wergirt, (li gorî nîvîskarê jînenîgeriya wî Rolan Porlan), navdariya wî ne tenê li Emerîka Latînî û navîn bû. Lê belê ew weke rojnamevanê Ispanya hate nasîn. Bi destxistina vê navdariyê li pey serdana

## ROBÎN DARYO

### BAVÊ FERMÎ YÊ WÊJeya EMERÎKA LATÎNÎ

### (EL-HAYAT)

## İBRAHÎM EL-ERÎS

### *Wergér: EJDER*

Ispanayê di sala 1892 an de ku ew weke nûnerê rojnameya xwe di şahîyen dozîneweya Emerîka de besdar bû.

**L**i Ispanya gelek qerraseyên helbestê naskir, û dest bi çekirina tama navdariya rastî kir. Dema ku vegeriya Erjentîne ew weke qonsulê Kolombiyayê, li Boynis Ayrisê xebitî û bi vî awayî ev bajar bû weke navendekî ji bo wî. Helbestvanen xort, li dora wî, weke pêşengê nûjentiya helbestî ku ji herkesi bêhtir bi nûjentiya Ewropî ve girêdayî ye, xwe civandin. Di vê demê de wî desteguleke nû ji helbestan û hinde nîvîsen rexnegirî weşand. Berî ku ji nûve vegere Ewropa daku gih li Ispanya bi cî bibe û gih berê xwe bide Firansa, herweha demekî li Parisê bi cî bû û li wêderê Vîrlîn û hinde helbestvanen sembolîzmê ku nêzîkî wîne naskirin. Ji wê çaxî ve, wî dev ji rîwîtiyê neqeriya, carna di hundirê Ewropa de û carna di navbera Kontînenta kevnar û cîhana wî ya Emerîka nûjen de, pirtûkîn wî li pey hev derketin. Gîringtîrîn berhemên wî di van waran de evin: **Parîzyana, Ispanya Nûjen, Zemînên Rojî...** Ev pirtûk teva di salên pêşî yêne sedsala bîstan de hatin weşandin. Daku xérhatinê bi sedsala nû bîne. Sedsala mirovan, ya serketina mirovatiyê hember tariyê.

**D**i sala 1908 an de, piştî ku serketî vegeriya Emerîka navîn, careke din vegeriya Ispanya. Vê carê weke şalyarekî Nîkaraguayî, lê zû ne dereng ji ser vî karî hate hilanîn. berê xwe da Parisê. Bo li wêderê bijî Lê carek din vegeriya Emerîka. Demeke mişt rîwîti deriderî bû, di jiyana wî de. Lê ev rewş ne bû kelem li ber nîvisandina helbestî û nûkirina wê. Herweha gelek berhemên helbestî li pey hev derketin. Ciwanê Emerîka ew bi germî distandin û bi şewaza wî dînîvisandin. Di encama berhemên weke: **Stranên Jîyan û Hêviyê (1907), Helbesta Payîzé (1910),** û di sala 1914 an de wî ramana xwe ya yekemîn **Zêrê Mayorka** piştî ku serdana girava Ispanî ya spehî diweşîne.

**L**ê ew demên ku tenduristiya wî ber bi paşve diçû, derbasî jîyanekî bohemî bû. Dest bi pirbûna rîwîti û vexwarin û çîrokên evîndariyê kir. Bili ku ducaran zewicî bû. Di salên dawî diyar dikir ku ew rengekî ji xwekuştina hêwasî dijî. Sala 1914 an li Niyoyekî bi nexweşîya sîngê ket. Du salan bişûn de li ser oxira ne vegerê çû. Piştî ku vegeriya cî û warê xwe Nîkaragua, bîyar da ku her tişî kêm bike, bi taybetî sala dawî ji jiyana wî, piştî çend heftîyan ji çapkirina pirtûka wî **Jînenîgeriya Robîn Daryo Bi Pênuşa Wî** di hembêza hevala rojên wî yên dawî **Françîska Sançî** de jiyana xwe qedand. Ew jî cotyareke ciwan bû. Li gundên Ispanya ew naskir û bû evîndarê wê, salên dawî jî ji yana xwe pêre qedand.

## NAMEYEK TÊR MÎNAK

*Name ji hela xwendevaneke agahdarî hatiye. Û ne ji bo weşanê hatiye nivîsandin. Lê piştî ku me destur xwest, weşand. Bi rastî dîtinê cihê û ramaneke têr rêcik û rêbûwarên dersstandinê têde hene. Bo xwendavan an û bêhtir ji bo nivîskar û rewşenbîrên me wê balkêş be. Xwendevan pirsan dike û li bersiva van pirsan digere. Herwiha me nexwest ev ramangîriya têr ronahî û şiyar ji me tenê re bimîne. Em di wê baweriyê de ne ku çanda Kurdî, wêjeya Kurdî bêhtirin ji ya herkesî pêdiviya wê bi xwendevanen şiyar, jîr û zîrek heye.*

*Name ji hela Şukran ERGÎNCÎ hatiye nivîsandin.*

*Kek M. Ferho,*

*Her çendî ku bi berdewamî agahdarî ji min re nayê û heyâ niha min xeynî du hejmarañ ne xwendiyê jî, ez aboneyê kovarê me. Ta berî çend mehan, min bi Kurdî xwendin-nivîsandin nedizanî. Malbata min Zaza ye (Kirmanc), lê, em bi her du zaraveyan jî diaxivin. Ji bo ku ez ji cîhana Kurdî agahdar bim, ziman hîn bibim, gelekit li saziyêñ me yêñ Stembolê geriyam. Lê belê bi hêviyeke şikestî, bi dilekî poşman min dest ji wan deran berda. Bi ve nameyê min xwest ku di şexsê te de kul û meremêñ xwe têxime pirsên sade û niqurçan, diyarı rewşenbîrên me bikim. Mebest ne xeyb û polemîk in. Ji xwe polemîk di nav kesen zana, rewşenbîr de çêdibin. Ez xwendekarek naçîzane me. Haa ezenî, mademekî ku dem dema yekîtiya neteweyî ye û em pêwistin ku viya wekî rohniya çavêñ xwe biparêzin, ka were ji xuşka xwe re bibêje.*

*1) Li Tuncelîler Derneğî (Komela Dêrsimîyan) ez rastî teksteke Larzan Jandîl hatim. Birêz Jandîl, bi kurtî tiştinêñ wiha dibêje. ‘...Namê welatê ma Kirmancî ye û namê zimanê ma Kirmancî yo... , Herwekî behsa bajarêñ Kirmaciye ye û hwd. dike. Li ser vê gellekî guftûgo çêbûn. Zaten bi zarê me xwe ji bin bandora dibistanêñ kemalîzmêñ sar xelaskiriye. Ma, ‘Kirmancî’ ne navê zaravayeki ye? Ma bi navê ‘Kirmancî’ yê welatek heye? Édi bila Kirmancî bêjin navê welatê me Kirmaciye û Soran bêjin navê welatê me Soraniye (!). Heger dengê min bigihişa birêz Jandîl minê bigota; ‘Ez jî Zaza û hem jî Elewî me. Çi pêwistî bi guftûgo û provakasyonêñ wiha dibînî? Ji xwe gelê me bi pirranî nezan e...’ Diviyabû ku cudatiyek di navbera me û rewşenbîrên me de hebûya. Heger rewşenbîrên me jî weke me nezan bin jî xwe me safî kir (!) Bila Jandîl ji bîr neke... Kêlîka destdirêjiya yekîtiya me bike -dibe ku niyeta wî baş be - ezzê ji vir heyâ Ewropa werim û dest têxim kiziya wan û heyâ giyan di wan de hebe kîn û nefreta hezar salan nîşanî wan bikim. Belê, ‘ji tunebûna mîran navê dîkan bûye evdirrehman.’ Hin ke xwe rewşenbî di hesibînin. Divê ewana li pêş me bin, ne ku li paş me bimînin. Alavan nedin dijmin û*

*mirovêñ nezan.*

*2) Di intelijansîya me ya Stembolê de bi rastî kesen xwedî kedêñ bihempa hene. Lê, atmosfereke wisa heye ku mirovêñ li duv pesnan û berjewendîyan digerin jî dikarin li wir bijîn. Heya ku dikarin cihêñ herî bilind jî bi destxin. Ezê bi kurtî bûyerek rave bikim û êdi tu fêhm bike. Armanca min ne ew e ku ez behsa kesan bi xerabî bikim. Dixwazim behsa hinek kesan û atmosferê bikim. A giring ew e; Zilam zana ye... Zilam rewşenbîr e... Zilam serê xwe bi alfabekeye nû re diêşîne... Zilam nivîskar e jî... Zilam xwedî cihekî bilind e... Ji zilam re xanî pêwist e... Ka em jî qaşo-maşo welatparêz in. Dive em alîkarê wî ba. Me gote wî, were mala me bimîne. Em li zilam xwedî derketin. Zilam êvaran ziman nîşanî me dide. Em şâ dibin. Zilam, ji xwişka min ya neh salî hes dike û (...) wê dinivîse kursa folklorê. Em ji teliya xwe ne bi bêhn bûn!.. Em bêçareyêñ xwedê!... Rojekê xuşka min kelogirî gote min (...), mirov ne radayî bû... Min di serî de bawer ne kir... Piştre bi azmun kirinekê dît ku rast e. Min, ew ji malê kire der. Ka minê çi bikira. Xuşka min di neh saliya xwe de çi diye, çi ne diye... Tirsa dijmin, şewitandina mala me, koçberî... Ji xwe gelek darbe dîne. Ka ez ê çawa psîkolojiya wê serrast bikim? Ma em Kurd çîma di serdema komputeran û dewra internetan de, wiha qels û neçarê mîjiyê xwe ne? Û tu li helwesta me binêre! Li pirsgirêkîn em pê mijul dibin binêre? Dive hûn rewşenbîrên me, ji atmosfera saziyêñ me yêñ Stembolê re formulekê bibînin. Formuleke wisa ku kesen xurîfî, bêsilûk nikarîbin di wan de bijîn. Nikarîbin ziyanê bidin gel. Nikarîbin berjewendîyen xwe yêñ gemarî pêk bînin. Min bibexişîne, dibe ku tarza min ne baş be. Ez pirr bi hêrs im. Hêrseke wiha ku nizanîm êrîş kî bikim.*

*3) Ez, her çendî ji ziman baş tênagihijim, ziman zan nînim û tenê xwendevaneke im, guftûgoyêñ ku hun li ser ziman dikin pirr şîndemayı, pirr prîmîtv, pirr ne pisporî hwd. dibînim. Çalakî, raperîn û pêgavêñ hun dikin têra sibe nakin. Problemên rast nivîsê li dera han, hun hê li ser alfabekeye ne gihane yek xalî û li hev nakin. Heryekî ji we bi awayekî dinivîsîne.*

Mazeretên we jî amade ne, (ji vî karî re dewlet pêwist e, ya min baş e, rêxistinê me guh nadîn van Bi kurtî kekê delal, ez ji te hêvî dikim, da ku li ser felsefeya (an jî taybetiyê) me Kurdan xebatekî bikî. Gelo teoriya min (!) pirr xelto-melto ye? Ez dibêjim ji van her çar fonksiyonên psikolojiya ronak (hişmendi, hêla ronahî ya hişmendiyê) yêner berme Kurdan rastegînî û mijulandin pirr pêşketiye, lê belê hest û konsepta pêşergê (bi maneya têgihiştinê) hêj zarok maye, qels e. Cihê ku hest tunebe ji xwe roman jî nîne. Kî bibêje em Kurd bi hest in ez bixwe bawer nakim. Çavşilekî, lorandin, mazoşizm hwd. nayê wê maneya (wate) ku em geleki bi his in. Ev mijareke pirr sereh e. Min bi kurtî behs kir. Hêvî dikim ku gotinê min têne jêhmkirin. A rastî kekê delal, ez dizanim tu rewşenbîrekî me yê pirr binbar û karbendî. Gotinê min hêj pirr in. Sê rûpel qedyan, êdî niha bes e. Min hin giliûgazinê xwe kirin, hin jî pêşniyaz. Heke ji te re giranî nebe li ser van mijaran mîjîyê xwe mijul bike û balê bide ser wan. Û hêvî dikim ku agahdarî jî bi berdewamî ji minre were. Silav û birêziyê xwe yêner herî germ dişinim û serketinê dixwazim.

**Sukran ERGİNÇİ**  
-Stembol-

Dîroka li ser zarfê: 24. 12. 96

**Têbînî:** Hin caran sedema ku li ser zerfê navêner Kurdi hene, bala rûreşan dikişine û zerfan diçirînin. Bila di bîra we de be...

## STRAN

Di zeviyê dûr de  
gava gurzegul holdibin  
li angorî şire-şirra Xabûr  
hest dikim ku çirokan dibêjin  
an jî dayîkbûnek westiyayî  
dilojar dibe  
lewra ew rûbarê evînê dimiçiqe  
ew jî bê zar ji dayik dibe  
û rêncberê Gundêr dûr  
hîn jî stranê delal dibêjin

**Teymûr EVDÎ**  
-Serê Kaniyê-

## DI KOLANÊN CUDA DE

Dixwazim ku te,  
di kolanêن cuda de dawetî dansê bikim  
Li ser pêgiheke qesayî bi xîşk û xêzik bişemitin  
Di kûç û kolanan de hemî bi hev re  
Lept û livandina delaliya teliyan  
Miçekçekêن xwe li ser bedana mirovan dipêçin  
Di nava germahiya gîtara Meksîkiyan de  
Di eyñî saetê de dansê bikin  
Di nava rîtmekê de  
Li ber dîloka Bûka Kurdan

Rev û çavên tirsonek dilerizin  
Hêrs û daholênu ku di yek temtêlê de lêdixin  
Dûbarekirina leyلانان  
Û bêdengî  
Pêgihek dansê bi zarakan re  
Bi xwarûpêcka daw û dêlan re  
Ronahiya di rûdêna Anatolya  
Ya têr nîgarî  
Û bende mana te di vê dansê de

Di bin dengê ber û fişekan de  
Were em çoşek sergûzeşti bikin  
Bi singoyê serê tivingan  
Heya bê têhniyek ji xwe bûrînê em bilîzin  
Û di vê dansê de mirî jî, li kêleke me rabin  
sîpiya  
Û em teva bi hev re guhdarî bikin  
Li dengê teqe-reqa piyan

**Eli Fuad BALLE**

## HELBESTA BÊ NAV

Evîndariyek e  
Hestênu ku li ber serê me pişkivî ne

Bêrikirinek e  
Zarokênu ku li sikakênu min i wêran  
digirîn

Awazek e  
Hêstirênu ku ji çavên hêrsî yê dayika min  
dirijin

Dilxweşiyek e  
Pênuşen ciwanik ku min digihînîn  
welat

**Eli Fuad BALLE**

# Jİ BO XWEDAYÊ ‘ŞAHBERHEMA TUNE’ ÇEND PIRS

*Pêşveçûna rastî; ne ji pêşverûwê tê, ji sedema pêşveçûnê derdikeve holê...*

B. Brecht

## Zulkuf GUNAY

Heger, huner karê ji nûjende afirandinê ye, berhema ku tê afirandin di destpêkê de nayê zanîn. Çiqasî hunermend, dabaşa rastî û ji xwe re kiribe armanc jî, ew tişte ku biafrîne mîna dxwaza wî ya destpêkê dernakeve holê. Pêhatiyen piştre derdi Kevin hemberê wî xwe pêwistî şirovekirin û berhimbéziyê dikin. Li vir, hunermend hember rastiyê û hinek pêhatiyen neçar dimîne. Bi vê neçariya hember rastî û pêhatiyen (heger hunermend jêhatî û zîrek be), dilgermî û dilbaziya xwe derdixe meydanê. Ev tê wê manê ku hunermend di nava me de, ne mîna mirovîkî civakî ye. Ew ji me bêhtir dibîne, tê digihije, hest û hewnîn wî bêhtir ji yên mirovîn dora xwe ye. Herwiha, van xisletên ne mîna yên kesî bi hunermendî bikar tîne û canekî nû dide wan. Zimanekî nû, estetîkek ne dîtî diafirîne.

Lê tiştek heye!.. Heger bi hunermend re, netewe, yan ji romantizma şoresheri tune be, van nûjenî û xasletên cuda nikare bide. Zor e!.. Ji ber vê çendê **Platon**, hunermendan bi ‘sivik û bi perr û bask’ dide nasîn. Dîtinek rast e... Ji ber ku romantizm, pêkanîna afirandin û bifermokirina gel, rastiyê di nava hunandina estetîki de dide hunermend. Têkiliyên komên xelkê û baweriya bi hunermend di encamên wilo de pêktên. Gelê ku bi xwe bawer be, azad e. Li gorî vê rewşê, hunermend, di bin binbariyek dîrokî de ne.

Yek heye: Ji hêlekê ve gel baweriyê bi hunermend tîne, ji hêla din ve hemberî wî dudîl ye. Ev rewş, ji hunandin û jîna lidarxistî tê. Hember légerîn û ji nûjende afirandinê, (ji ber ku jîneke nû ye) hunermend dibin perçiqandinê de dihêle. Dive neyê jibirkirin ku ‘xwedatî, navê dûrbûn û dijberiyê ye.’ Ew berhimbézkirin û nirxandina mezin ji bo klasikan, hişmendî û daxwaza hember afirînen nû dinava xwe de dihilgire. Bêguman, rêbûwariya dîrokî ya huner û pêşketin û guhertinê komên xelkê pir û kopriya gihiştina pêşerojan e ku tu tirsa mirov ji pêşerojan namîne. Herwiha hember dîmîti û sergerdehiya hunermend, yan jî bi degeliyek pirr mezin afirandin û bifermokirina holê navê pêşketin û guhertinê bingehîn e. Hember derketina kevnarı û berberiya dijwar bi kevneşopiyê re dilpenahiyek mezin dide xelkê. Ev e, ku pirr mijara azadî û serbestiya hunermend tê masetê û dibe dabaşa civakê. Nûjeniya ku bi degeliyek mezin tê lidarxistin e. Gihiştina hunermend ya van xasletên bilind, yan jî xwedayê berhema ‘şahberhema tune’, bi hişmendî, firaze, xweza-civak û nêzîkbûna wî ya bi bûyer û pêhatiyen cihanê ve girêdayî ye. Ji ber vê çendê ku em li civaka xwe, li rastî û pêkhatînen mezin û welatê xwe dinêrin; tê dîtin ku çand û wêjeya me dibin perçiqandina politîk-islamî de, di destpêka sedsala me de jî dibin bandora kolonî-emperyalîzmê de gihaye ber mirinê.

Hember zor, asîmîlasyona neqam berxwedanê mezin nebûye. Ew bê nasnamehiya politîk di çand-wêje de bi xurtî derketiye holê. Lewra, serhildan û têkoşîna gelê Kurd ya dawî ku heya giha konaxa iro pirr berdelêne mezin dan, piştî rawestandina ser lingan ku komên xelkê bi pirranî ev têkoşîn berhimbézkirin û xwe lê pêçan ji wê perçiqandin û helandina bê nasnameyî tê. Rastiye ku gelê Kurd berê xwe daye, ax e, ra û qoratêni di nava axê de ne ku teva bingeha wî ne. Tê zanîn ku kolonyalîstan bi dijwari hêris berdana ser ra û qoratêni di nava axê de ku bi hezeran sal mîweyên têr çej û pirrnîşî, dibûn. Ji ber vê çendê pêwistiya xwedî derketina li şunewarî û wê kevnariya têr nîgar derdi keve hemberî me. Alav û halet ji bo kesen hunermend. Helbet ne bi yek dengî, bi yek rengî. Pêkanînek piirrengî, piirrdengî, mîna organîzasyona orkestreyek xurt û zîrek ku harmoniyen têr dilşahî bide. Li vir dixwazim ku dest bi pirsên xwe ji wî mirovî Kurdistanî yê xwedayê wê ‘şahberhema tune’ bikim.

1/Hûn, dikarin vê tevger û guhertina tê pêhatî û bûyerên mezin dinava hûmandina berhemên xwe de bidin? Yan ji, hun xwediyyê wê romantizma ku utopya civakî û neteweyeta şoresheri ne?

2/Têgihiştin û ragihadina te bi gelê Kurd re ku huner tê de heye di kîjan qonaxê de ye? Tu nirxandinê komên xelkê derbarê estetîzmê de erê dike? Bo ferehî, kûrkirin û bilindkirina vê derfetê tu ci dibêje û ci armanc li pêsiya te hene?

3/Hember tenetîyi, bîganeyî û qelsiyê, hember biyanî bûna kesayefî û civakî ku dijmin bi armanc nêzîkî huner û çanda Kurdan dibe û her mîna imbûr û alavê politîk ji bo xwe bi kar tîne, tu ci dike? Hember, dijminên ku bi hezeran sal e mîna kijînakian xwîna ax û erd û mirovan dimerêsîn, tu alternatifâ têkoşîna gelê Kurd çawa dibîne? Di vê hêlê de tu dikarî hunerê xwe mîna berdevk û pêşbazi bide pêş.

4/Di navbera hunermendîn her çar parçê û cîhanê de têkiliyek çawa heye? Parçebûna axê, zaravayê cuda ci tekçûn û xerabiyê di ziman û hestên civakê de dike û hun ji bo çalekiyên pêkanîna yekitiyek pirhêli ci dîkin û dikarin ci bikin?

5/Ji bo ferehbûn û bilindbûna şoresha çanda Kurdi, yan ji ronesansa çanda Kurdi, hun di hêla wêne, müzik, şano, sinema, folklor, wêje de ci dîkin? Di vê hêlê de Medya Kurdi, rewşenbir ji bo pêkhatina alternatifek hunerî rola xwe dileyizîn?

Belê, vala nehatiye gotin ku hunermend çavdêre dema xwe ye. Di vê dema ku cîhan serûbinî hevûdin dibe, xwedayê afirandinê yên Kurdistanî ku ‘şahberhema tune’ berbendi wan e, gelo dikarin di nava pêlîn okyanusun de berbakê xwe vekin û ber bi gerdûnê biçin? Gelên ku ji çand û wêje û huner fam neke, dîzarê xwedayê jîndarên xwînê ne.

Nameyeke  
giring  
û  
dîrokî

Weke ku ji namê jî tê fam  
kirin, dema Birêz Ismet  
Serif Wanli di sala 1976  
an de ji hêla dewleta  
Iraqê ve hate  
birîndarkirin ev name li  
ser têkiliyên dinavbera wî  
û senatorê Beljikî yê hêla  
Flaman Birez Willy  
Kuijpers de dide diyar  
kirin.

Lausanne: 1. 11. 1976

Birêz Wily KOIJPERS  
Parlamentar - Beljika

Hevalê hêja,

Hezar spas ji bo wê dosya kurdi ku Serbest, li Berlinê da min. Herweha ji bo karta te û hêviyên xweş ku te piştî êrişa (suîkasta) icramî (krîmînal) ya ji aliyê Bexdayê, ku li ser jiyana min bû, ji min re xwestin.

Ez hîn ji li nexweşxanê me. Ez bi mînakeke ecêb ji mirinê xelasbûm. Du gulle ku di her du hêlênen serê min re derbas bûn, rûyê min jî ji hev neket. Araguşa min bi 16 cihan şikest. Hê navenda tewazînê ne sazkar e û çena min jî 80 % ji hassayieta xwe hunda kiriye. Lî, li gora textorê min ev hemî wê baş bibin.

Min ji textorê xwe xwest ku devê min weke ku divê çê bikin. Çimkî ez bi biryar im ku têkoşîna xwe li hember dijminen gelê Kurd berdewam bikim. Û vê têkoşînê ji nuh li ser bingehênen nûjen berdewam bikim.

Li gorî saloxdanen di desten min de hikûmeta Bexdayê digerê da ku navnîşana min nas bike; dibe ku êrişike (suîkasteke) din li dij min li dar bixin. Ezê hikûmeta Iraqê bidim dadgehê. Hem li Swisra û hem jî li dadgeha navneteweyî, heger derfet hebe, li Neteweyê Yekbûyî jî vê pirsê didim wan. Ew hikûmeta ji mucrîmîn (krîmînalên) dijminê merovaniyê û mirovkûj, dive cih di nav Neteweyê Yekbûyî de nebîne. Abukatên min yên Swisri dido ne:

- 1- Birêz Philippe CHAULMONTET, 8, Place St. François-1003 Lausanne, Tel: 021. 22. 29. 44
  - 2- Birêz Genevieve ZIRILLI, abukatek jin e, Av. du Tribunal Federal, Tel: 021. 23 78 74
- Bilî van du abukatan yekî Kurd jî, ji Suriyê û li Parîsê heye. Bi wan re jî abukatê Parîsi Mr. Patric Bandoin, Av. Rapp, 9-Parîs, Tel: 555 45 44 heye.

Goman heye ku komîteyek ‘avneteweyî ji abukatan’ were sazkirin, ji bo ku min biparêze û ‘piştgiriya livbaziyyê (aktion) bike. Ez bi bawer im ku abukatên Beljikî û bi taybetî yên Flamanî ji bo alîkarîyê wê dilxwaz bin ku tevlî vê komîte bibin. Heger tu hin abukatên weha nas bikî, li Flanderen û Hollanda hunê dikaribin ji wan re vê rewşê bînin ziman ku têkiliyê bi abukatên min yên Swisri re ji bo afirandinê vê komîte deynin. Heger mimkin be nav û navnîşanen wan bi min bide zanîn. Delegesyonê ji Kurdên penaber li Hollanda ewê di nexweşxanê li Lausanne werin serdana min. Di hefteya ku 15ê meha yazdeha dest pê dike, ev delegasyon tê û heger tu bixwazî tiştekî bi wê re bişînî (name û tiştên weha) tu dikari ji hevalê min re telefon bike.

D. H. Mahmoud

Develstein, 223, Amsterdam, Tel: 20. 98 56 89

Ezê rojekê li Beljika, weke ku ez hêvî dikim, werim serdana we.

Silav ji hemî hevaltiya navbera du gelan û hevaltiya Dr. Ringoed.

**İsmet Cherif Wanly**

(Not: Telefona min ya klînikê ev e: 20 12 51)

P. S. -not ji birêvebirîya nexweşxanê- Lî ji kerema xwe çenabe ku hun wî seredan bikin.

## AMADEKARIYA FERHENGA KURDÎ DEST PÊ KIR

**1-** Enstituya Kurdî ya Brukselê di kongreya salane de (1996) biryar hate standin ku komîçkek bê damezrandin û amadekariya Ferhenga Kurdî bike. Kesên ku xwe dane pêş û xwestin ji bo vî karî hewl bidin û keda xwe têxin nava karûbarê pîroz, bilî Belçîka, li welatêñ din yê Ewropa jî derketin. Lê, komîçka bingehîn ku bi kar rûne û amadekariya bingehîn bike, ji kesên li Belçîka dirûnin hatin damezrandin.

Komîçka amadekar ji van kesan pêkhat:

**Torî**  
**Mistefa Qesrî**  
**Beşîr Komar**  
**Ejder Mihemed**  
**Kerîm Baqustanî**  
**Derwêş M. Ferho**  
**Medenî Ferho**

Li Elmanya: **Feqîr Ehmed**  
**Mihemed Qawas**  
**Faris Xoce**

Li Swêd: **Marîna Ezîz**  
Li Frensa: **Xusrow**

**2-**Dibin serokatiya Torî de, civîna komîçka amadekarên Ferhenga Kurdî ya yekemîn 24.01.1997 an de pêkhat. Di vê civînê de bi pêşniyazên ferhengek çawa û bi ci awayî amadekirinê hate rawestandin. Li gorî guftûgoyêñ duvdirej û bi nirx, l'gorî rewşa îro û ferhengê ku heya niha hatine amadekirin, dibin formulasyonek zanistî û

ramangîriyek hemdemî de dagirtina valahiya mezin ku pirtûkxaneya Kurdî bê ferhengek bi serûber e. Ferhengê ku heya îro hatine amadekirin di hêla gotin û peyvan de pirr qels in û bersiva serlêdana pêwistiyê nadin.. Lewra, berhevkirina gotinan bi encamek dorferehî, piştre lêgerîna pirtûkên nû û klasik... Herwiha têkiliyên bi welat re... Pişti danheva gotinan, komîçka amadekar li ser zagonêñ ferhengan dibin çavan re derbas bike û veke.

**3-** Civîna duyemin roja duşemê (3.03.1997) pêkhat. Di vê civînê de li ser rengê danheva gotinan û amadekarên di pîşê xwe de zanist hate rawestandin. Di encamek dorfereh de, li gorî pîşê xwe, ji her çar zaraveyêñ Kurdî gotinan berhev bikin û hewl bidin ku di pêşerojan de bersiva pêwistiyen bidin. Herwiha hefteya bûrî kê çi kar kiriye hate ser masetê û li ser karûbar, bo di pêşerojan de kar ne mîne di gotin û bes di rûniştinan de. Biryar hate standin ku em bêjin û bipêjin. Heger em bêjin û ne pêjin, pêwistiya ziyana demê tune ye...

**4-** Herwiha her hefte roja duşemê, di encamek berdewamî de civînên amadekirina ferhengê pêk têñ û li ser karê rojêñ bûrî tê rawestandin.

**5-** Daxwaz û hêviyêñ me ew in ku xwendevanêñ me, nivîskar û rewşenbîrêñ me jî tevlî vî karê pîroz bibin. Mirovên ku daxwaz bike, em amade ne ku her hefte raporêñ karûbar jêre bişînîn û ew jî cihê xwe di nava komîçka amadekar de bigire.

## DÎ VÎ WARÎ DE AGAHNDARÎ WÊ BERDEWAM BİKIN

